Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1352 | 18-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Jin û berdêl

**Cûdî Cizîr**



Her çiqas di dîrokê de berdêla xwedîderketina li kedê bi dilêşî be jî di encama wan berdêlan de serkeftin û guhertinên dîrokî çêbûne. Îro di dab û nêrîtên civakê de guhertin rû didin. Lê belê li hember van guhertinan astengiyên paşverû, kuştin, êş û jan jî pêş dikevin. Ev bingehê xwe ji ku derê digire? Bêguman ji hişmendiya paşverû û newekheviya bi sedê salan e di nav civakê de hene û çavkaniya xwe ji wê digire. Di têkiliyên civakê de newekhevî destpêkê ji bindestîbûna jinê û desthilatiya zilam tê. Di jiyana mirovan de bûyerên derketine holê bêguman girîng in û di dema xwe de bandor kirine. Pêwîst e mirov di wextê wê de bigire dest, lê pê ve aliqî nemîne. Bûyer tenê nikare dîrokê îfade bike, ji ber ku teng dimîne. Jin û ciwan pêwîst e hîn zêdetir tevlî têkoşînê bibin. Ji ber potansiyeleke pir mezin a jin û ciwanan heye. Eger ciwan ji bo mafên jinan têkoşîn bikin wê polîtîkayên emperyalîzmê yên li ser jinê bêbandor bikin. Felsefeya Rêber Apo îro li tevahiya Rojhilata Navîn bûye navenda têkoşîna demokratîk û azadiyê. Jin kulîlkên bihara qirnê bîst û yekê ye. Ji bo vê jin û ciwan bi kûrahiya dilê xwe mîna kulîlkên berfîn li hemberî kevneşopiyan serî radikin. Jin ji bo mafê xwe divê bibin rêwiyên azadiyê. Ji ber vê yekê guhertin û veguhertin bi zîhniyeteke nû ji bo civakê pêwîstiyek e. Yên guhertin û veguhertinên nûjen pêş bixin, bi taybet jin û ciwan in. Xwedîderketina li nasnameya jinê xwedîderketina li mafê xwe ye. Jin afirînera kedê ye. Bi taybetî sembola yekemîn ya kedê ye. Jin her tim avakera jiyanê ye. Mirovahî di dergûşa jinê de mezin bûye. Keda wê gelek mezin û dîrokî ye. Lewma dibe serkêşa jiyana nû. Di cîhanê de bi pêşketina zanist û teknîkê re di metodên têkoşînan de gelek guhertin çêbûne. Di demeke herî girîng de ji bo afirandina jiyaneke azad a ji gelê Kurd re gelek têkoşîn, berxwedan û nûbûn pêş ketin.

Bi ruhekî civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê ya xurt mirov xwe li beramberî xeta Rêber Apo berspirsiyar bibîne gelekî girîng e. Di bin her şert û mercî de divê mirov berjewendiyên gelê Kurd, jinan û mirovatiya bindest fêm bike. Dema mirov van mijaran digre dest bêhtir pirs û nakokî bi mirov re çêdibin. Gelo jin û gelên bindest wê bi çi awayî karibin xwe ji zext û zordariya serdestan biparêzin? Her tim pergala desthilatdar xwestiye jin û Kurdan ji holê rake, yan jî jinan ji xwe re bike xulam. Pergala serwer hewl dide jinan di tarîtiya dîrokê de winda bike û ji pêşengiyê qut bike. Lê belê dîsa jî li hemberî hemû astengî û keleman têkoşîna jinan didome û hêvî ti caran naşikin. Jin bûye ruhê têkoşîna Apoyî; lewma jî jin êdî gihane asta zanebûna hebûn û pêşeroja xwe. Li dijî bindestî û zordestiyê gelek jin bûne ronahî û çirûskên agirê berxwedanê. Êdî jin baweriya xwe bi wê ronahiyê tînin. Ev jî bisaya Rêber Apo ye. Ti caran zarokên Rojê xwe ji ber tîna tîrêjên ku ji axê re bûne çavkaniya jiyanê nadin alî. Di dîrokê de ya yekemîn ku ji civakbûnê re rêvebertî kiriye jin e. Jin zanyar û pêkhênera jiyanê ye. Ya yekem car tişt afirandine jin bi xwe ye. Di nava çirûskên agir de xwestibûn jiyanekî nû bidin afirandin. Jina têkoşer û Apoyî bi dilê xwe yê zêrîn, bi asîmanên şîn, bi hêviyên rojên geş, çalakiya jiyana nû av da.

Pêwîst e jin tîrêjên azadiyê yên ronahiyê hembêz bike. Ji bo jin tişta herî girîng, biryara têkoşînê ye. Bi baweriyeke bi rûmet û fikreke azad wê jin bi hêza Rêber Apo bibe meşaleya azadiyê. Şoreşger wêrek û fedakarin. Ji lewra jî divê palpişt û mîraseke mirov hebe. Divê berxwedaneke mirov ji xwe re kiribe hêz hebe da ku coş bigire. Têkoşîna me ya rizgariya neteweyî ya di pêşengiya Rêber Apo de dê di demeke herî kurt de bighêje serkeftinê!

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER WESTAN Û BÊHNVEDANÊ**

**Çirika wî çûye virika wî derketiye:**
- Pir westiyaye.

Dinya bezand:
- Xwe pir westand; xwe pir êşand.

**Gêra stiriyan pê kir:**
- Serê wî pir êşand; gêj kir; westand.

**Hewayek berda:**
- Bêhna xwe vekir.

**Hewayek ji ber serê xwe berda:**
- Bi heman wateyê.

**Îmana wî leqand:**
- Pir westand.

**Îq û zîqên min derketin:**
- Ez perîşan bûm; ez ji ta û ba ketim; ez ji hev ketim.

**Îq û zîqên min tev de derbas bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Ji desthilanîn ketiye:**
- Pir westiyaye.

**Ji lem ketiye:**
- Xwe li ser xwe nagire; pir westiyaye; pir sist bûye.

**Lingên me li guhên me ketin:**
- Em pir westiyan; ji westanê em perîşan bûn.

**Lingên min li pey min nehatin:**
- Ez pir westiyam; ez ji hêzê ketim.

**Navika me xist:**
- Em westandim; em bêmecal kirin; bêhna me pir teng kir; em pir mijûl kirin.

**Pişta xwe rast nake:**
- Pir diweste.

**Roj nîvro min stêr bi çavê xwe dîtin:**
- Ez pir westiyam; karê min pir giran bû.

**Ruhê wî gihat serê bêvila wî:**
- Pir westiya.

**Şoravik di serî re derxistin:**
- Pir westandin.

**Tilmiska wî derket:**
- Pir westiya; ti li halê wî nema; perîşan bû.

**(Tiriyê hatî guvaştin, ava wî jê hatî girtin jê re tê gotin tilmisk)**

**Tirşika wî derxist:**
- Pir westand.

**Tu dibêjî qey sêwiyan bi dawa wî girtiye:**
- Xwe pir diwestîne; pir bi liv û tevger e.

**(Kesê zarokên wî mabin sêwî xwe pir diwestîne)**

**Virtoqên mirinê di devê me de hatin:**
- Em pir westiyan; em pir êşiyan; hal li me nema.

**LI SER ÊŞANDINÊ Û LÊXISTINA PIR**

**Çirika wî çûye virika wî derketiye:**
- Pir êşiyaye; pir lê xistine.

Çirika wî çûye virika wî maye:
- Bi heman wateyê.

**Gêra stiriyan pê kir:**
- Bêzar kir; perîşan kir.

**Kevir û kuçik li min barîn, xêr û xweşî li te barîn:**
- Tiştek nema ku neanîn serê min; ji her alî ve êrîşî min kirin.

**Şîrê xîç ji ber didanên wî anî:**
- Pir êşand; pir eziyet dayê; pir qehirand; pir aciz kir.

Şîrê zikmakî di pozê me de anî:
- Em perîşan kirin; em xistin tengiyeke mezin; em pir êşandin.

**Şoravik di serî re derxistin:**
- Pir êşandin; pir lê dan.

**Tenga wî kişandin:**
- Hesab jê pirsîn; zor danê; heyfa xwe jê standin.

*Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî*



Bi kamîreya Hemza Sêvo

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1352 | 18-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Yekîtiya Kurd wê ruhê Şoreşa Rojava biparêze



Gelê Kurd li hemberî zor û zilma desthilatdaran agirê şoreşê gur kirin, berdêlên giranbuha dan û serî ne çimandin. Îro jî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ya ku gelê Kurd bo doza xwe lidarxistinbûn rûbirûyî metirsiyên mezin in, ji ber ji her alî ve plan li ser têkçûna wê ve tên meşandin, lê yekîtiya Kurdan rê li ber vê yekê girt û serkeftin tacîdar kir.**R-5**

## Li Îranê zêdetirî 200 jin hatin kuştin û 7 bijîşk û hemşîre hatine girtin



Ev serhildana li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ji çar serhildanên berê yên 2017, 2019 û 2022'an cuda bû, ji ber girseya gel bi hemû hêza xwe tevlî dibe. Tê de hedefgirtina jin bi awayekî sîstamatîk hate kirin ku heyanî niha zêdetirî 200 jin hatin kuştin ji wan du bijîşk in. Herwiha 7 bijîşk û hemşîreyên jin hatine girtin.**R-2**

# KURD JI PAŞGUHKIRINÊ BER BI MASEYA DIYALOGA NAVNETEWÎ VE

Konferansa Munîh a Ewlekariyê yek ji konferansên herî girîng e ku tê de serokên welatan û kesayetên xwedî bandor dicivin û mijarên ewlekariya cîhanî tên nîqaşkirin. Beşdarbûna pêşengên Kurdan ji Başûr û Rojava di konferansê de gaveke girîng e ji bo parastina gelê Kurd, hem jî hewldaneke ji bo bidestxistina mafê Kurdan li Rojava di destûreke bingehîn a Sûriyê de.**R-6**










## ‘Şengal û Başûrê Kurdistanê di ihtîmala êrîşan de ye’


Hevseroka MXDŞ Cîhan Celo diyar kir ku li Rojavayê Kurdistanê alozî bidomin, bê guman wê êriş li ser Şengal û li Başûrê Kurdistanê jî werin kirin, lewra gerek civak, keç û xurtên me seferberiya li Rojavayê Kurdistanê ji xwe re bikin mînak ku ew jî li ax, şervan û hêzên xwe xwedî derkevin, ji bo em dîsa rastî fermaneke din neyên.**R-4**

## Çeteyên DAIŞ’ê zarokên xwe bi heman îdeolojiyê mezin dikin



Kampa Roj yek ji kampên ku jin û zarokên DAIŞ'ê tê de hatine bicîhkirin ku heta niha jî zihniyeta radîkal a DIAŞ'ê di nava xwe de diparêzin, îro jî bi heman îdeolojiyê zarokên xwe perwerde dikin.**R-3**

## ‘Hebûna pirtûkxaneya Kurdî li pêşangeha Şamê gaveke girîng e’



Hevserokê Desteya Çandê ya kantona Cizîrê Ilyas Sîdo diyar kir ku hebûna beşek ji pirtûkên bi zimanê Kurdî li Pêşangeha Pirtûkan a Şamê weke cara yekem bingehek girîng a çandî ye û got, “Baskê Kurdî wekî insiyatîfek ji aliyê Wezareta Çandê ya Sûriyê ve, ne wekî insiyatîfek hevbeş an vexwendinek rasterast ji bo desteyên fermî yên Kurdî ye."**R-9**

Nefes li me teng bûye! — Nehîr pale R-2


Menuya Komplogeran — Farûk Sakik R-4


Çima êrişî Rêveberiya Xweser kirin? — Dilyar Cizîrê R-6


Entegrasyona demokratîk hişmendiya cudakariya civakî red dike — Ehmed Hesen R-7


pêşangeha pirtûkan a Şamê û belengaziya hin rewşenbîrên Kurd — Kemal Necim R-9


Ronahîya Ji Tarîtiyê Derdikeve — Gulîstan Xalid R-10

# Li Îranê zêdetirî 200 jin hatin kuştin û 7 bijîşk û hemşîre hatine girtin


Ev serhildana li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ji çar serhildanên berê yên 2017, 2019 û 2022'an cuda bû, ji ber girseya gel bi hemû hêza xwe tevlî dibe. Tê de hedefgirtina jin bi awayekî sîstamatîk hate kirin ku heyanî niha zêdetirî 200 jin hatin kuştin ji wan du bijîşk in. Herwiha 7 bijîşk û hemşîreyên jin hatine girtin.

**Esma Mistefa**

Jinan di serhildana Çileya 2026'an a li Îranê de roleke navendî û wêrek lîstin, mil bi mil bi mêran re sekinîn û pir caran di pêşengiyê de bûn. Di vê serhildanê de jinên ciwan û pîr, dayik û keçên wan, yên temenê wan ji 13 heta 66 salî bû; hemşîre û jinên malê, xwendekar û endezyar; jinên ji her herêm û pêkhateyê, her wiha piraniya dayikan bi destê zarokên xwe girtine û birina qadên berxwedanê.
Careke din jinan serkêşî ji serhildan û xwepêşandanan re dike. Wan dirûşmeyên 'mirin ji Xameneyî re, mirin ji dîktator re, û ku ev sal dê bibe saleke xwînrijandinê ku Xameneyî dê tê de bikeve', berz kirin.
Ew gelek caran bi hêzên Kirmaşanê û hêzên din ên tepeserker ên rejîmê re rû bi rû bûn da ku wan neçar bikin ku paşve vekişin. Lê belê; li ber topên avê sekinîn, kolan girtin, paşve gav neavêtin û gelek ji wan ji bo wêrektiya xwe bedela herî mezin dan.
Serhildana qehremanî ya jin û mêran li Îranê bi hovîtiyeke zêde re rû bi rû ma, ji ber ku xwepêşanderên ku li seranserê welêt kolan tijî kirin rastî komkujiyeke pir xirab hatin. Hêzên hikumeta Îranê weke ku ev gel ne gelê wê ye tevgeriya û nêz bû. kolanên Îranê ji xwîna gelê sivîl tijî bûn. bi fermana Xameneyî hêzên hikumeta Îranê biryara gulebarandinê li ser gel bi mabesta kuştinê dest pê kirin. Sekvan li ser baniyan û malan danîn û rasterast hiş û mejiyê sivîlan bê cudakarî ku jin e, mêr e, mezin e yan bi biçûk e. Li gorî îtîrafkirina Xameneyî bi xwe, bi hezaran kes hatine kuştin. Li gorî Rêxistina Mucahidînên Gel a Îranê (PMOI/MEK), zêdetirî 50'î hezar kes hatine girtin. Rêxistinê her wiha navên hezar û 5 kesên ku di dema serdegirtina tund a rejîmê ya li ser serhildana Çileya 2026'an de jiyana xwe ji dest dane belge kir û weşand. Di nav qurbaniyên ku nasnameya wan hatiye diyarkirin de 125 jin û 65 zarok û ciwan hene. Lê belê dibe ku hejmara qurbaniyan ji viya zêdetir be ku her roj bi dehan kes têne kûştin û girtin.

**Lîsteya navên jin û keçên ku di serhildan û xwepêşandanên Rojhilatê Kurdistan û Îranê de hatine kuştin**

Di vê çarçoveyê de, Komîteya Jinan a Meclisa Berxwedana Neteweyî ya Îranê lîsteya jin û keçên ku di serhildana Çileya 2026'an a li Îranê de di têkoşîna azadî û wekheviyê de jiyana xwe ji dest dane, belav dike.
Ekrem Bîrkzî (dayikek ji du zarokan re ye)- Robîne Emînîyan- Ayda Heyderî- Zehra Bahlolî Bor- Nazlî Can Bror- Mansora Heyderî (dayîkerk ji du zarokan re)- Solmaz Sehranî Daryan- Negîn Qedîmî- Zehra Benî Emriyan- Klala Mehmudî Azar- Zehra Muradî- Arzû Medenî- Barmiyad Şad Bcarkanî- Ernîka Debax- Semîn Ristemî (Hemşîre û dayîka du zarokan)- Ayde Eqîlî- Meiyîde Muradî Kiya- Nstrn Zerea Miniş- Xezal Agay Lendî- Arzû Ebdî (dayîka du zarokan)- Muna Hiseyînî- Zehra Baqirî (dayîka du zarokan)- Ferzane Tewekulî (Dayika du zarokan)- Brîsa Neqîbî (dayika du zarokan)- Zîbe Destcerdî (dayika zarokek 8 mehî û du canî bû)- Soniya Salihî Rad- Nesîm Bor Exanî- Meryem Salihî Siyawşanî- Şebnem Ferdosî- Sehbae Reştiyan- Zehra Fedlî- Sara Behbodî- Şeile Stude (du canî)- Sanam Bor Babaî- Mebîne Behiştî- Fatîme Ezetî- Nercis Ilmî- Nediye Deştî- Melîka Şehrodî Destîb- Îlham Zeynelî- Tîba Rîdaî (dayika du zarokan)- Mehna Dokoşkanî- Fatîma Tebîbî- Nîlovir Mesudî- Sadîqa Celalî- Zehra Mihemed Bor- Brwana Xocendî Bor- Meryem Hiseynî- Naznîn Esmî Xanî- Stayîş Sozan Abadî- Sona Yekta- Esel Şefîyî- Fatîma Ebdelî- Zehra Azadbor- Sîma Mosoyî- Feîza Mstan- Cemîle Şafîyî- Şkofa Ebdî- Naznîn Zehra Salihî- Hacar Îshaqî- Parîsa Leşgerî (dayika du zarokan)- Nîhaye Rehîmî Deştî- Reha Tacan- Neger Ecem- Leyle Eşnebesendî- Îlîna Hectî- Nesteren Ebdî- Îlîna Bahramî- Kîmîya Kemiyab- Zehra Şamay Zade- Erfa Bîgî- Nadiya Xoşfekran- Semîra Xanî- Sumeye Rîdaî- Fatîma Borsadahî- Yalda Caferî- Parasto Carahiyan- Mehîn Rihmetî- Sema Îsmayîlî- Esîne Hisîniyan- Bihar Şadmehrî- Sogand Emanî- Biharan Tahêr Xanî- Azam Hisenî- Ridwan Ebdî- Tîna Nor Elî- Teniya Ebasî—Rozîra Rox Zade- Nestren Leşgerî- Barya Galafend- Zeyneb Ferd- Naznîn Seyidî- Semîne ebdî- Sayîna Nîzam Dost- Feyîze Hiseyînî Necad- Diyana Biharî- Fetîma Hatim Sengerî—Muna Esmî (dayîka zarokekî)- Masoma Ibrahîmî- Fereşte Recebî Exbaş (dayika du zarokan)- Îlha Nurî- Mehsa Dezfolyan Kermanşahiyan (Bijîşka diranan)- Stayîş Şeqiyî- Rozêta Hecî Zade- Seher Felah- Leyla Şukrî (dayika sê zarokan)- Malak Rdwiyan (dayika sê zarokan)- Bihar Babaiyî (dayika sê zarokan)- Bantiya Giyasî- Fatîma Îmam Dost- Nîrvana Ehmedî- Zehra Necfî (du canî)- Enûşa Hemîdî- Melîne Esedî- Şehla Kakaiyî- Enîsa Hoşeng Kşkolî- Radiya Rihmanî- Safora Caferî- Fatma Sultanî- Gulse Şerîfî- Zehra Mehmedî- Perwîn Ezîzî (Hemşîre)- Melîka Şahmeradî.
Hêjayî bîrxistinê ye ku ev nav dibe hemû jinên hatine kuştin di nava xwe de nehewîne û ev lîste wê her bi demê re bê nûkirin.



**Kiryarên li ser kadroyên bijîşkî yên jin li Îranê**

Di vê serhildan û xwepêşandanê de rejîma melayan ne tenê serî li tepeserkirina kolanan da, lê di heman demê de nexweşxane jî wekî amûrên zext û kuştinê bi kar anîn. Qutkirina bi zanebûn a amûrên ventilasyonê, pêşîgirtina li dermankirina birîndaran û girtina wan ji nivînên nexweşxaneyê û heta ji hundirê odeyên emeliyatê, avêtina guleyên dilovaniyê li ser birîndaran, û tepeserkirina sîstematîk a bijîşk û karmendên bijîşkî yên ku ji bo alîkariya birîndaran bezîn, hemî sûcên li dijî mirovahiyê û binpêkirina eşkere ya hemî pîvanên exlaqî û qanûnî ne.
Gelek rapor ji bajarên cuda yên Îranê nîşan didin ku hêzên ewlehiyê yên rejîmê, hem di dema sekinandina xwepêşandanan de û hem jî piştî wan, bi berdewamî êrîşî nexweşxaneyan kirine. Di van serdegirtinan de, bijîşk û hemşîreyên ku lênêrîna birîndaran dikirin rastî gef, lêpirsîn an jî girtinan hatin; ev pratîk binpêkirinek eşkere ya prensîbên bingehîn ên karê bijîşkî û mafên mirovan temsîl dike.

**Di bava van kiryarên yên derheqê kadroyên bijîşkî hatine kirin de hin ji wan doktor û hemşîreyên jin in jî**

**1. Parisa Barkar, bijîşka çavan:** Ew ligel hevjînê xwe Dr. Mesûd Abadî Fard Azerî ji ber dermankirina xwepêşanderên birîndar li Qezwînê hat girtin. Derbarê cih û rewşa wan de ti agahî tune ye.
**2. Golnar Naraqî, pispora bijîşkiya acîl li Nexweşxaneya Haşemî Nejad:** Ew di 8'ê Çile de hate girtin û ji 29'ê Çile ve li Girtîgeha Qarçaxê ye.
**3. Fatma Avşafrî (Tahran)**
**4. Dr. Xezal Amîdî:** Ew ji ber ku alîkariya yekem dabîn kiribû ji xwepêşanderên bajarê Abdananê re hate girtin, û ti agahî li ser çarenûsa wê tune ne.
**5. Dr. Farîba Hoseyînî, pijîşkeke diranan a 37 salî ye:** Di 2'ê Çile de piştî ku hêzên ewlehiyê ji ber beşdarbûna di xwepêşandanan de bi ser mala wê ya li Şîrazê de girtin, hate girtin. Çarenûsa wê nayê zanîn. Dr. Farîba xwedî dîrokeke girtinê ye ji ber nivîsandina dirûşmeyan û beşdarbûna di xwepêşandanan de.
**6. Dr. Amîna Soleymanî, bijîşk û rêvebera klînîkeke çerm û por li Erdebilê:** Ew ji aliyê hêzên ewlehiyê ve ji ber pêşwazîkirin û dermankirina xwepêşanderên birîndar li wî bajarî hate girtin, û ti agahî li ser wê tune ye.
**7. Dr. Şemsî Abbasalîzadeh, pijîşka jinan û endama fakulteyê li Zanîngeha Zanistên Bijîşkî ya Tebrîzê:** Piştî ku ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bi tundî hate lêdan, di dema serhildanê de hate girtin. Li gorî raporên medyaya civakî, dibêjin ku ew beriya demekê hatiye berdan.
Wekî ku berê jî hate gotin, rewşa yasayî û cihê ragirtina gelek ji van kesan hîn jî ne diyar e, û malbatên wan bi berdewamî rastî zext û gefan tên.
Ji bilî navên ku hatine behs kirin, hejmarek hemşîre û karmendên bijîşkî di serhildana Çileya 2026an de bûn qurbanî (kuştin), di nav wan de Samîn Rustemî, hemşîre û dayika du zarokan, û Parvîn Ezîzî, ku navên wan di lîsteya Komîteya Jinan a Meclisa Berxwedana Neteweyî ya Îranê de bûn.

**Ji Pênûsa Jin**



**Nefes li me teng bûye!**

**Nehîr Pale**

Ji sala 2019`an heyanî 2026`an min jina ereb bi hemû ziraviyan şopand. Jina karker, cotkar, bermal, karmend, rêveber kesekî negot:`Nefes li min teng bûye`. Sedem çi be jî hemû jinan dixwestin di sazî, tevgerên jin û bi Rêveberiya Xweser re bixebitin. Ew cara yekem bû projeyekê destûr dida jin bixebitê, têbikoşe û hebûna xwe diyar bike. Jin li wan herêman gihîştin asta bûn rêveberên sazî û navendan. Di hemû desteyên Rêveberiya Xweser de ciyê xwe di sîstema Hevserokatiyê de girtin. Li wê civakê gihîştina jin a asta ku bibe rêveber û civakê birêve bibe, firsetekî mezin bû.
Jinên hevjînên wan wefat dikin an jî ji hevjînên xwe cûda bûne, ji civakê kesek xwedî li wan dernakeve. Malbata bav jî tiştekî nade wan û xwedî li zarokên wan dernakevin. Tenê di nava sîstema Rêveberiya Xweser de dikarîbûn cî bigrin. Gihîştibûn asta sazî û meclisan birêve bibin. Ne tenê bi nav rêveber bûn, li hemberî mêr têdikoşiyan, êdî rê û rêbazên mêr li hemberî jinê lêpirsîn dikirin. Bi sedan li hevdû kom dibûn, pirsgirêkên jin dinirxandin û li çareseriyê digeriyan.
Sîstem bi ketina HTŞ`ê ya wan herêman hilweşiya. Jin dibêjin ew fetisîne û bê nefes mane. Her gaveke HTŞ`ê li kolanên Reqayê, çeteyên DAIŞ tîne bîra wan. Saet 07:00 sibehê heyanî saet 12:00 li dibistanên Reqayê ayetên Quranê datînin. Piştî wê heyanî nimêja eşayê saet 07:20 li mizgeftan berdewam dikin. Li hemû kolanên Reqayê quranê belav dikin. Mîna ev çend sal bûn her kes ji dînê Islamê dûrketiye û bûne kafir. Bi hemû gavên xwe re bibîrtînin ku Reqa berê paytexta DAIŞ`ê bû û êdî divê jin xwe bikşînin qilifê xwe û dernekevin. Balkêş nemînin ku saziyeke bi navê polîsên exlaqî çêbikin da ku jinan bişopîn in û wan ceza bikin.
Li bajarê Tebqa, Reqa û Dêra Zorê êdî wê sîstem û civak di bin navê adetan de hîn zêdetir êrîşî jinan bikin. Jinên ku di saziyên xweser ên jin û bi Rêveberiya Xweser re xebitîne, êdî wê bidin aliyekî. Di nava civakê de cî ji wan re nîne, sîstem jî wê her tim weke dijmin li wan binêr e.
Jin di dîrokê de gelek caran hatiye şikandin, niha jî li ser asta cîhanî sîstemên dagirker êrîşî jinê dikin. Li Rojava, Îran û Tirkiyê êrîşî şoreşa `Jin, Jiyan, Azadî` dikin. Di encama êrîşên HTŞ`ê jin li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê şikestin. Jinên ku di asta rêxistinî, rêveberî, pîşeyî de gavên mezin avêtibûn, niha li ser hemûyan hat ferz kirin ku bibin hemşîre, mamoste, bermalî û dirûnker. Bi sedan ji wan bê karin û nikarin pêdiviyên xwe yên malbatî pêk bîn in.
HTŞ`ê xebatên jin li ser xwe xeter dît û bi van êrîşan re dawî li xebatên jinên Ereb anî. Ji ber vê yekê hemû xebatkarên jin ên Tebqa, Reqa û Dêra Zorê tengav bûne û dibêjin em dixeniq in. Gotina xeniqandin dema ku jin bikar tîne tê wateya ew bi saxî hatiye kuştin û destdirêjî rûmeta wê kirin e.



# Azadiya Rêber Apo mijareke serekeye di rojeva çapemeniya cîhanî de

Komploya navneteweyî ne tenê li dijî Rêber Abdullah Ocalan bû, lê belê gelê Kurd û projeya Aştî û Civaka Demokratîk hedef digre. Di heman demê de armanc ew bû ku her hewildaneke ji bo avakirina rêyeke demokratîk di navbera pêkhateyan de têk bibe.

**Navenda Nûçeyan**

27 sal li ser komploya navnetewî li ser Rêber Apo re derbasbûn. Di destpêka sala 1998'an de li dijî Rêber Apo komployeke navneteweyî bi serkêşiya NATO'yê hate destpêkirin û di 15'ê Sibata 1999'an de hate revandin û radestî dewleta tirk hate kirin, vê komployê ne tenê şexsê Rêber Apo hedef girt, lê belê gelê Kurd bi giştî di kesayeta Rêber Apo de hate hedefgirtin. Di heman demê de armanca komployê ew bû ku her hewildaneke ji bo avakirina rêyeke demokratîk li ser bingeha biratiya gelan di navbera hemû pêkhateyan de were valederxistin.

**Li her deverê azadiya Rêber Apo tê xwestin**

Li Hindistanê komek ji welatiyên Hindistanê bi armanca şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê çalakiyek pêk anîn. Çalakiya şermezarkirinê li paytexta Hindistanê Delhiyê hat li dar xistin, tê de pankarta,"Ji Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan re mafê hêviyê xwestin. Mandelayê Rojhilata Navîn ev 27 sale di girtîgeha Tirkiyê de dîl tê girtin".
Di çalakiyê de daxwaza azadiya Abdullah Ocalan anîn ziman. Herwiha li ser pankartê ligel wêneya Mohandas Karamçand Gandhî wêneyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî hate hildan. Endamê Parlementoya Hindistanê yê berê Aneel Prasad Hegde jî axaftinek kir, tê de komploya 15'ê Sibatê şermezar kir û daxwaza azadiya Abdullah Ocalan kir.

**Ji Îspanya banga 'Ji Abdullah Ocalan re azadî**

Sendîkayên cuda yên li Îspanya û herêmên wê yên xweser, beriya 15'ê Sibatê daxuyaniyeke hevpar weşand û daxwaza serbestberdana Rêber Abdullah Ocalan û naskirina statuya siyasî û civakî ya gelê Kurd kir. Di daxuyaniyê de îmzeya sendîkayên ji Îspanya, Welatê Bask, Galîstya, Katalonya, Astûryas û Giravên Kanaryayê cih girt.
Saziyên îmzekar diyar kirin ku ji bo dabînkirina aştî û stabîlîzasyonê li Rojhilata Navîn, azadiya Rêber Apo "lezgîn û pêwîst e" û banga serbestberdana wî ya tavilê kirin.
Di daxuyaniya hevpar de hat gotin: "Em sendîke, pabendbûna xwe ya bi piştgirî û dadwerî dubare dikin; em bang li hemû sazî û hikûmetên cîhanê dikin ku piştgiriyê bidin serbestberdana Abdullah Ocalan û naskirina mafên gelê Kurd."
Sendîkayên îmzekar ev in: Konfederasyona Sendîkayan a Komîsyonên Karkeran – CCOO, Konfederasyona Navsendîkayî – CI, Konfederasyona Giştî ya Karkeran – CGT, Konfederasyona Navsendîkayî ya Galîstya – CIG, Kolektîfa Karkerên Yekbûyî – CUT, Herikîna Sendîkayî ya Çep a Astûryas – CSI, Piştgiriya Karkerên Bask – ELA, Konfederasyona Sendîkayî ya Çep – ESK SINDIKATUA, Navsendîkayî ya Alternatîf a Katalonya – IAC, Navsendîkayî ya Astûryas – INAST, Navsendîkayî ya Valensiya, La Intersindical (Katalonya), Komîteyên Neteweperest ên Karkeran – LAB, Tevgera Karkeran a Giravên Kanaryayê – MTC, Rêxistina Sendîkayî ya Karkerên Aragon – OSTA, Konfederasyona Piştgiriya Karkeran.

**Di çapemeniya cîhanî de Azadiya Rêber Apo di rojevê de ye**

Ajansên Agence France Presse (AFP), MediaPart û 20 Minutes ên Fransayê, çalakiyên protestoyî yên di 14'ê Sibatê de li Strasbourgê hatin lidarxistin kirin manşeta xwe. Di nûçeya bi sernavê "Bi hezaran çalakvan li Strasbourgê ji bo berdana Abdullah Ocalan hatin gel hev" de bal kişand ser daxwaza çalakvanan a ji bo azadiya fîzîkî ya Abdullah Ocalan û statuya Rojava.




Stasyona radyoyê ya bi navê Radio Onda d'Urto ya Îtalyayê jî di nûçeya xwe ya bi sernavê "Kurdistan: Abdullah Ocalan berdin, Rojava biparêze" de hate gotin ku li gelek bajarên Îtalyayê çalakiyên protestoyî hatine lidarxistin. Di nûçeyê de hate gotin ku her sal Kurdên ku 15'ê Sibatê weke "Roja reş" dibînin, li Ewropa û çar aliyên cîhanê çalakiyan li dar dixin. Hat diyarkirin ku êrişên li dijî Rojava jî di salvegera komployê de hatine kirin.
Agenzia Nazionale Stampa Associata (ANSA) a navenda wê Îtalya jî çalakiyên protestoyî yên li Îtalyayê derxist pêş û got: "Pirsgirêk, êrişên qirkirinê ên li dijî Kurdan e." Ajansa nûçeyan a navenda wê Îtalya Pressenza'yê jî protesto bi sernavê "Milano, careke din ji bo Rojava û Abdullah Ocalan li qada ye" parve kir. Di nûçeyê de wiha hate gotin: "Abdullah Ocalan, tevî şert û mercên giran ên girtîgehê jî hêj rê nîşanî gelê xwe dide. Gelek ê ji wî hez dike û daxwaza azadiya wî dike heye. Her çend weke ku li Tirkiyê her tişt baş xuya bike jî, pêvajo disekine; hêdî pêşketina pêvajoya aştiyê, diwestîne."
Platforma medyayê ya aydê Reutersê, Reuters Connectê jî çalakiyên li Qamişlo derxist pêş û bi sernavê "Kurdên Sûriyê, li Qamişlo bi daxwaza berdana rêberê xwe Abdullah Ocalan meşê li dar dixe" parve kir.

# Hevdîtinên şandeya Rojava li Konferansa Ewlehiyê ya Munîhê di çapemeniya cîhanê de ne

**Navenda Nûçeyan**

**Di medyaya Amerîka, Ewropa, Rûsya û Ereban de nûçeyên derbarê beşdariya şandeya Rojava naveroka hevdîtinan, peyamên dîplomatîk û bandorên wê yên li ser Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê bi çarçoveyên cuda hatin nirxandin.**

Hevdîtinên Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê û Hevseroka Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ahmed yên li Konferansa Ewlehiyê ya Munîhê di çapemeniya cîhanê de cihek berfireh girt.

**'Di mîmariya ewlehiyê pêşketina rola hêzên Kurd'**

Ajansên nûçeyan ên Amerîkayê pêşveçûn zêdetir bi perspektîfa ewlehî û hevkariya leşkerî nirxandin. Reûtersê derbarê hevdîtinên di konferansê de hatine kirin wekî pêşketina rola hêzên Kurdî di mîmariya ewlehiya navneteweyî de nirxand û ev hevdîtin wekî "têkiliyên dîplomatîk ên krîtîk ku paşeroja hevkariya li dijî DAIŞ'ê diyar dikin" bi nav kir. Assocîated Pressê jî hevdîtinên Abdî û Ahmed yên bi berpirsên Ewropa û DYA'yê wekî nîqaş li ser "Rêxistinên ewlehiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û rewşa girtîyên DAIŞê" pênase kir.

**The Guardîan: Kurd zêdetir derdikevin pêş**

Çapemeniya Ewropayê, beşdarî zêdetir ji aliyê meşrûtiyeta dîplomatîk û temsîla siyasî ya Kurdan ve hate şîrovekirin. Rojnameya The Guardian a Brîtanyayê bal kişand ser hevdîtinên konferansê, têkiliyên bi serokên Ewropayê re û ev yek wekî, "zêdebûna xuyabûna aktorên Kurd di muzakereyên paşeroja Sûriyeyê de" nirxand.

**'Kurd li platformên navneteweyî ne'**

Di çapemeniya Rûsyayê de jî beşdariya konferansê bi zimanekî zêdetir jeopolîtîk û hişyartir girt dest. Di nûçe û şîroveyên RIA Novostî û TASS'ê de bal zêdetir ne li ser kesayetî, lê li ser encamên teşedarî hate dayîn. Di analîzên Rûsyayê de wateya hevdîtinan wiha tê şîrovekirin: "Bi van hevdîtinan cih girtina Kurdan a di nav teşedariya nû ya Sûriyê de, di platformên navneteweyî de tê nîqaşkirin." Herwiha hevdîtin wekî hewildana DYA'yê ya parastina qada bandora xwe hate pênasekirin.




**'Mînaka dîplomasiya bilind'**

Çapemeniya Ereban jî zêdetir li ser aliyê dîplomasiya herêmî û normalîzasyona bi Şamê re hate rawestîn. Al Arabiya, hevdîtin wekî, "Mînakek dîplomasiya bilind ku kêm tê dîtin, di navbera DYA, Sûriye û QSD'ê çê bû" pênase kir.

**'Siyaseta piştî şer tê mûzakerekirin'**

Al Jazeerayê trafîka dîplomasiyê ya li paşperdeya konferansê vegot û ev pêvajo mîna, "Hevdîtinên ewlehiyê yên piralî ku tê de teşedariya piştî şer a Sûriyê tê muzakerekirin" bi nav kir. Ajansa herêmî Shafaq News jî bal kişand ser peyamên Şamê û pêvajoya entegrasyonê bi gotina, "Domandina muzakereyên li ser tevlêbûna gav bi gav a QSD'ê di sazûmaniya dewletê de" ragihand.

**'Rewabûna Kurdan zêdetir bû'**

Di nirxandinên hevbeş ên çapemeniya navneteweyî de û bi taybetî çapemeniya Ewropayê de beşdariya asta temsîla Kurdî li Konferansa Ewlehiyê ya Munîhê ne tenê wekî pêşveçûnek protokolî, wekî bilindbûna meşrûîyeta Kurdan a di qada navneteweyî û mijarek stratejîk a girêdayî paşeroja şerê Sûriyeyê, mîmariya ewlehiyê û hevsengiya hêzên herêmî hate nirxandin.

# QSD'ê mirovahî ji DAIŞ'ê xilas kir

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ji 2015'an de li hember DAIŞ'ê şer dike û tevahî Rojhilata Navîn jî hêzên herî xeternak parast. QSD'ê ji bo tevahî pêkhateyên li Sûriyê bû hêviya jiyenek bi rumet

**Stêrk Mihemed**

Di 10'ê Cotmeha 2015'an de Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Piştî têkçûna DAIŞ'ê li Kobanê û ji ber firehiya qadên şer Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ku YPG û YPJ'ê stûnên wê yên bingehînin, hat damezrandin. Bi dirêjiya 10 salan QSD'ê gelek serkeftin û guhertinên mezin di qada leşkerî û siyasî de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêkanîn. Herwiha piştî avabûna QSD'ê di 2015'ê an de bi awayekî fermî QSD'ê bû hevalbenda koalîsyonê Navneteweyî ku bi hev re li dijî DAIŞ'ê şer bikin. Di heman demê de di hin operasyonên li dijî DAIŞ'ê bi piştevaniya koalîsyonê Navneteweyî dihatin pêkanîn.

**Hemleyên Hêzên Sûriya Demokratîk**

Di nav hemleyên herî girîng ên ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk ji destpêka damezrandina xwe heta îro dane destpêkirin ev in:

**1-Hemleya rizgarkirina Holê**, yekemîn hemleya leşkerî bû ku Hêzên Sûriya Demokratîk dest pê kiribû.

**2- Hemleya Xezeba Firatê ya rizgarkirina bajarê Reqa û Tebqa**

Di demekê de ku Reqa û Tebqa di nava qeyran û komkujiyan de jiyan dikirin Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ew ji mirinê rizgarkirin. DAIŞ'ê Reqa kiribû paytexta DAIŞ'ê û xwe têde berfireh û mezin dikir. QSD'ê ev plana wan têkbir û cîhan ji çeteyên herî xeter rizgar kir.
22'ê Adara 2017'an, hêzên QSD'ê yekemcar bi desteka hêzên koalîsyonê ji hewayê ve xwe danîn rojavayê Tebqayê ku li aliyê din ê Çemê Firatê ye. Şervanan di destpêkê de berê xwe dan Balafirgeha Leşkerî ya Tebqayê û roja 26'ê Adarê balafirgeh rizgar kirin. Piştre di 6'ê Nîsanê de gundên Safsafah û Îbadê ji çeteyan paqij kirin. Bi rizgarkirina herdu gundan re şervanên QSD'ê derdora Tebqa û Bendava Tebqayê dorpêçkirin. Roja 10'ê Gulana 2017'an, di roja 50'î ya operasyonê de navena Tebqayê û Bendava Tebqayê (Firat) bi temamî hatin rizgarkirin.
Li gel dijberiya dewleta Tirk ku bi dîplomasî û gefan hewlda hêzên YPG û YPJ tevlî Pêngava Xezeba Firatê nebin, lê belê hêzên QSD'ê yên bi pêşengiya YPG û YPJ'ê di asta pêşengiyê de cihê xwe di hemû qonaxên pêngavê de girtin û serketina Reqayê diyarî gelan û jinan kirin.

**3-Hemleya Xezeba Xabûrê**

Hêzên Sûriya Demokratîk di Sibata 2016'an de hemleyeke nû di bin navê "Xezeba Xabûrê" de ji bo rizgarkirina bajarokê "El-Şedadê" û başûrê wê dan destpêkirin. Gundê bajarê Hesekê, armanca sereke ya hemleya rizgarkirina bajarê stratejîk "El-Şeddadê bû".

**4- Hemleya rizgarkirina Minbicê û gundewarên wê**

Operasyona "Destgirkirina Firatê"çend mehan hat rawestandin, Hêzên Sûriya Demokratîk amadekariya operasyoneke mezin ji bo rizgarkirina bajarê Reqê ji çeteyên DAIŞ'ê dikir. Ji ber wê yekê di 2'ê Hezîrana 2015'an de dest bi operasyona rizgarkirina bajarê Minbicê hate kirin. 25'ê Kanûna Pêşîn a sala 2015'an pêngava rizgarkina bajarê Minbicê li ser erdê hate destpêkirin. Di 15'ê Tebaxa 2016'an de rizgarkirina tevahî bajarê Minbicê hate ragihandin.

**operesyona 'Mirovî û Ewlehiyê**

Kampa Holê yek ji kampên herî xeter ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ku bi hezaran ji malbetên DAIŞ' di nava xwe digirtin. Kampa hole ku bi hezaran ji jin û zarokên DAIŞ'ê tevî şaneyên veşatî tê de diman xeteriya vê kampê ne tenê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû, lê belê li ser tevahî Sûriyê û Rojhilata Navîn bû. Ev kamp ku di bin çavdêriya hêza QSD'ê de dima. Di vê kampê de malbetên DAIŞ'ê ji bo domandina hişmendiya Îslamî ya DAIŞ'ê gelek bûyerên ne rawa dikirin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn, YPG, YPJ û QSD'ê bi salan dikarîbûn ku cîhanî ji terorîstê biparêzê û ji bo parastian hermên gelek şehîd li vê kampê hatin dayîn.
Herwiha ji misogerkirina ewlehiyê di hundir herêmê de û parastina tevahî Rojhilata Navîn ji DAIŞ'ê gelek Operasyon di hundir kampê de ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn (Asayîş) bi piştgiriya QSD, YPG û YPJ'ê li Kampa Holê hatibû destpêkirin. Gelek opresyon di bin navê "Mirovî û Ewlehiyê" de hatin destpêkirin. Armanca operasyonê qelskirina hucreyên DAIŞ'ê, eşkerekirina şaneyên veşartî û baştirkirina rewşa mirovî ya di kampê de bû. Ev operasyon wekî pêngaveke girîng ji bo ewlekariya kampa Holê û herêmê hate dîtin. Lê piştî êrişa li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin û çeteyên hikumeta demkî êrişî ser kampa Holê kirin ku bi saleye hêza QSD'ê parastina cîhanê ji xeteriya vê kampê dike, dema ku hikumeta demkî eriş ser kir û kete bin kamtrola wan de gelek çeteyên DAIŞ'ê ji kampê derketin û metirsiya vê jî geleke.
Bi sedan ji malbetên DAIŞ'ê ku destê wan di kuştin, komkujî û bûyerên dijmirovî de hene di nava vê kampê de cihê xwe digirtin niha jî piştî ku hikumta demkî a Sûriyê ew kamp




kir bin kontrola xwe û gotin emê cîhanê biparêzin hatine berdan. Piştî ku QSD'ê ji van herêman vekşîn û hikumeta demkî ya Sûriyê hat ev çeteyên DAIŞ'ê hatin berdan daxwaza wan dîsa careke din DAIŞ'ê li Rojhilata navîn û bi taybet li Sûriyê vejîn bikin. Niha jî planek wisa heye ku dîsa û careke din piştî ku QSD'ê Rojhilata navîn ji DAIŞ û qirkirinê xelas kir wan çeteyan careke din bînin ortê û wan li seranserî cîhanê belab bikin
.

**Rola jinê di van operesyonan de girîng bû**

Ji destpêka Şoreşa Rojava de jinê di her qadê û operesyonê de roleke pêşeng û sereke dilîst. Di tevahî opresyonên ku QSD'ê tê re derbas bûye bi piştevaniya YPJ'ê bû. Li Reqa di demekê de ku jin dibûn qurbaniya zihniyeta DAIŞ'ê YPJ'ê bû hêviya jiyanek bi rumetm ji jinên Ereb re. Hêza jina Kurd û şervanên YPJ'ê bi taybet li tevahî cîhanê bandoreke mezin kir. YPJ'ê hemû jinên Rojhilata Navîn ji zihneyata DAIŞ'ê ya paşverû rizgar kir. Tililiyên şervanên YPJ'ê ji DAIŞ'ê tirs bû. Ew ji hêza jinê ditirsîn û li xwe qebûlnedikirin ku li ser destê jinê werin kuştin. Lê şervanên YPJ'ê ew têkbirin, mînaka herî mezin li Kobanê bû û fermandarê nemir Arîn Mêrkane ku xwe di DAIŞ teqand. Niha jî bi hezaran li ser şopa Arîn Mêrkan dimeşin û rêya wê ya têkbirina DAIŞ'ê berdewam dikin.

**QSD'ê hêviya gelan e**

Hêzên Sûriya Demokartîk (QSD) ku piştî şerê Kobanê a li dijî DAIŞ'ê hate damezrandin ku piştevaniya xwe ji hêzên YPJ û YPG'ê girt. Avabûna QSD'ê destpêkek nû ji bo şer û têkbirina DAIŞ'ê bû. QSD'ê ji destpêka damezrandinê heya roja me ya îro bû nimûne ji hemû pêkhateyan re, di nava xwe hemû pêkhate girtin. QSD'ê ji bo gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê xelasbûna ji DAIŞ'ê bû mînaka herî mezin Reqa bû ku bibû paytexta DAIŞ'ê, hemû gelê Reqa di nava talan û komkujiyekê de jiyandikirin. Herwiha jiyana jinan bi taybet di nava tarîtiyê de bû, serjêkirin, parçekirina laş, revandin û bi sedan awayê kiryaran li Reqa, Tebqa, Minbic, Dêrzor dihatin kirin. YPJ'ê û QSD'ê ew gel rizgarkirin, ji tarîtiyê anîn ronahiyê û jiyanek birumet ji wan re afirinadin.
Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi şerê xwe ya li hember DAIŞ'ê ne tenê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji qirkirin û komkojiyê xelas kir, lê belê Rojhilata navîn û tevahî aliyên Kurdistanê parast û li pêşiya qirkirina mirovahiyê ji DAIŞ'ê girt û digire. QSD'ê bi fermandar, rêveberî û şervanên xwe ev zêdetirî 10 sala ne di nava têkoşîn û berxwedaniyê de ye. QSD'ê bûye mertala parastinê ji tevahî gel û pêkhateyê di Sûriyê de Kurd, Ereb, Ermen, Aşûr, Ciho û Siryan. Ev tevahî pêkhate cihê xwe di nava herêmên di bin parastina QSD'ê de digirin û mafê hemû pêkhateyan tê parastin herwiha hemû pêkhate cihê di nava hêzên QSD'ê de digirin. QSD'ê ne tenê li hemerî DAIŞ'ê şer kir, lê belê li hember dewleta Tirk a dagirker ku hemû çeteyên DAIŞ'ê piştevaniya xwe ji dewleta Tirk digirin şer kir. Hemû pêlan û êrişên ku li Sûriyê dihatin meşandin destê dewleta Tirk têde hebû ku hertim di nava hewildan û planan de ye da ku hebûna gelê Kurd tune bike, lê belê QSD'ê ji bo parastina gelan hertim di nava tevgerê de bû û hemû planên qirkirinê ku li ser gelê Kurd dihat kirin dişkand û heya niha jî QSD'ê bi vê armancê berdewam dike. Herwiha heya vê kêliyê planên qirkirinê yê ku dewleta Tirk hewildide li ser gelê Kurd bide meşandin û dîsa DAIŞ'ê vejîn bike dişkîne û ji bo parastina gelê xwe hertim di nava hewildan û çareseriyê de ne. QSD'ê bû dengê hemû pêkhateyan di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, ji bo gelan avabûn û vejînbûna ji nû ve piştî hewildanê qirkirinê bû.
Li beramberî hemû êrişan û hewildana tunekirina hebûna gelan, gelek şehîd û berdêlên giran QSD'ê dan da ku destkeftî û nasnameya pêkhateyab biparêze. Ji destpêka şoreşê û heya roja me ya îro li hemberî dagirkeriya tirk û çeteyên DAIŞ'ê zêdetirî 12 hezar şehîd û 20 hezar birîndar hatine dayîn herwiha di nava wan de zêdetirî 5 hezar şehîd ji pêkhateyên Ereb in.



## Ronahîya Ji Tarîtiyê Derdikeve

**Gulîstan Xalid**

Di her serdemeke dîroka mirovahiyê de demên tarî hatine jiyan kirin. Serdemên tarî ji bo mirovahiyê demên dijwar in, dema ku zanîn, aramî, aborî û avahiya siyasî hemî di heman demê de hildiweşin. Sedemên sereke yên derketina holê ya van serdeman bi gelemperî hilweşîna siyasî, şer, krîzên aborî, nexweşî, paşketina çandî û wêranbûna ahangiyên civakî ne. ew demên tarî ku bûne sedemên zilmê, cehaletê, bê edaletiyê û êşên giran ku birînên kûr di dil, ruh û mejiyên mirovatiyê de dane vekirin. Lê di her serdemê de hin kes hebûne ku riya xelasiyê dane nîşandan û ev kes ji jiyana asayî wêdetir, ne tenê ji bo gelê xwe, lê ji bo mirovahiyê jî bûne ronahî. Ji lewma hebûna wan kesan êdî tenê ew kes an hawirdoreke teng têkildar nake, gelek, mirovatiyek û serdemekê bi xwe re vejîn dikin. Di vê serdema me de jî keseke ku bi têkoşîneke demdirêj xwe ava kir û bi xwe re mirovahiyê ava dike heye, ew Rêbereke ku ne ji rêzê ye. Rêberê ku em qala wî dikin navê ronahîyek wisa ye. Ev Rêber, ku tevahiya jiyana xwe ji bo têkoşîna rastî û azadiyê seferber kiriye, ne tenê Rêberê gel e, lê di heman demê de afirînerê ramanên mezin ji bo mirovahiyê ye.
Elbette em qala Rêber Apo dikin. Pir nivîs hatine nivîsandin û pênase ji bo Rêber Apo hatine kirin, lê dema ku em di şexsê geleke ku bi xwe re mirovatiya azad ji tûnebûnê anî hebûnê û encamên roja îro ku di ronahiya felsefeya Rêber Apo de di vê têkoşînê de hatiye pêşxistin dibînin, em dighêne wê baweriyê ku hêjaye her wext qala kesayet, ked, têkoşîn, berxwedanî û felsefeya kûr ya Rêber Apo bikin. Komplo û neheqiyên hêzên desthilatdar yê navneteweyî ku ev 27 sal Rêber Apo xistine zindanê, bi salan ji azadiya wî ya fîzîkî bêpar hiştin. Lê ruh û hişê wî qet teslîm nebû; berevajî vê, heta di nava tariyê de jî, wî têkoşîn berdewam kir ku ev rengê têkoşîna herî zehmete, têkoşîna fikrî ku pê asoyên nû, ramanên rastîn û xweşik afirand. Salên zindanê berde ku nikarîbû vê îradeya mezin bişkîne, salên di zindanê de ramanên Rêber Apo kûrtir kirin û veguherand şehrezayiya gerdûnî.
Rêber Apo ne tenê Rêberek afirîner û zû dihizire, lê di heman demê bê ku dev ji rêgez û felsefeya azadiyê berde û ji wan tavîzan bide nîşan dan, di siyasetê de nerm, lîstokên heyî têk dibe û bi hemleyên ku kes ne li bende bûye şekil dide qonaxên dîrokê. Elbette ji bo ku mirov vê asta xwe avakirina li gel Rêber Apo bi hemû aliyan ve feam bike gereke mirov baş diyalektîka pêşketina Rêber Apo ya ku ji zaroktiya wî ve heya roja me ya îro hatiye vekole. Ramanên Rêber Apo dilê bi mîlyonan kesan vekir; ew bû evîn, hêvî, berxwedan û şehrezayiyek. Mirovahî di kesayetiya Rêber Apo de guherî; têgihîştina wê ya azadî, edalet û rastiyê di veguherînek radîkal re derbas kir. Sira vê hêza Rêber Apo di rastiya wî ya hilberînê de ye, bêyî ku hêza xwe winda bike, di tariyê de jî ronahiyê diafirîne. Ji ber vê yekê Rêber Apo ne tenê ji bo gelê xwe, ji bo hemû mirovahiyê dibe Ronahî. Jiyan û têkoşîna Rêber Apo çîrokeke bê dawî ya ronahiyê ye ku ji tariyê derdikeve; Rêber Apo manîfestoyeke berxwedanê, hêvî û mirovahiyê ye.



# Çeteyên DAIŞ'ê zarokên xwe bi heman îdeolojiyê mezin dikin

Kampa Roj yek ji kampên ku jin û zarokên DAIŞ'ê tê de hatine bicîhkirin ku heta niha jî zihniyeta radîkal a DIAŞ'ê di nava xwe de diparêzin, îro jî bi heman îdeolojiyê zarokên xwe perwerde dikin.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Çima Kampa Roj**

Kampa Roj a girêdayê bajarê Dêrikê li Rojavayê Kurdistanê di sala 2015'an ve ji bo koçberên Şedadê, Tebqa û Reqa hat avakirin ji ber di wan salan de Cebhet Elnûsra êrişê wan cihan kirin, piştî ku Cebhet Elnûsra têk çûn ev koçber vegeriyan cihên xwe. Êdî Çeteyên DAIŞ'ê berê xwe dan Mûsil û dest bi qelîman kirin lewma gelê Mûsil û Şengalê ji malên xwe koçber bûn û hatin li Kempa Roj bicih bûn, piştî ku şervanên kurd bi qehremaniya xwe dîrok nivîsandin û DAIŞ têk birin welatî careke din vegeriyan malên xwe. Ji sala 2017'an ve piştî têkçûna DAIŞ'ê kampa Roj bû cihê jin û zarokên DAIŞ'ê. Di destpêkê de hijmarek kêm ji malbatên DAIŞ di vê kampê de bicih bûn, lê ji ber ku gelek tevlîhevî li kampa Hol çêdibû rêveberiya kampa Roj xwest bar li ser wan sivik bike û di sala 2019'an de beşekî din di hundirê kampa Roj de çêkirin da ku malbatên din werin û li wir bicih bibin û nêzî 396 malbat di kampa Roj de cihê xwe giritin. Di sala 2023'an ji ber ku gelek bûyerên kuştinê li kampa Hol derdiketin, kempa Roj bar girt ser milê xwe ku cihê xwe berfirehtir bike û 144 malbatên din anîn.

**Hijmara kesan di kempa Roj de**

Di kempa Roj de ji 40 heyanî 50 nijadên cûda hene, ji Mexrib, Tunis, Cezayîr, Rûsiya, Istraliya, Elmaniya, Qeter û hwd. Di dema niha de di kempa Roj de 11 malbatên Sûrî hene ku hijmara wan 52 kes in û 16 malbatên Iraqî ne ku 75 kesin. Di heman demê de 742 malbatên ecnebî ne ku 2,201 kes in. Di salên borî de hin malbat radestî malbatên wan yên esasî hatin kirin, lê hijmarke gelekî kêm bûn û tu guhertin çênekir. Sala 2025'an 11 dewletên Awropî hatin da ku hemwelatiyên xwe bibin lê tenê 16 malbat ji Kampê derxistin, hijmarek wiha kêm tucarî nabe çareserî ji vê pirsgirêkê re. Tevî ku hertim Rêveberiya Xweser û rêveberiya kampa Roj jî gelek daxuyanî jî didin da ku dewlet werin malbatên girêdayî xwe bibin, lê ew encamên mezin bi dest nedixistn.



**Radestkirina malbatên çeteyan ji Awûstralya yê re**

Di salên borî de radestkirina malbatên DAIŞ'ê wiha bû ku dewletên derve têkilî bi dayîreya têkilyên derve re dikir û li gor wê têkiliyê tensîq dihat kirin û malbat diçûn. Dewleta Awûstraliya di sala 2022'an de 3 malbatên xwe birin, lê di 16'ê Sibata 2026'an de hinekî ev sîstem cûda bû, di hundirê Awûstralyayê de hinekî nakokî hebûn, lewma dewleta Awûstraliya têkilî bi dayîreya têkiliyên derve re nekir, tenê bi malbatên ku dixwazin xizmên wan ji kempa Roj derkevin û vegerin welatên xwe re bûn alîkar û kaxezên pêwîst û Pesportên wan kesên di kempê de amade kirin, da ku malbat bi xwe ji Awûstralya yê berê xwe bidin kempa Roj û xizmên xwe bi xwe re vegerînin. Rêveberiya Kempa Roj jî ev rewş li ber çavan re derbas kir û wek rewşeke mirovî girt dest û derxistina malbatên ostralî ji kempa Roj qebûl kir. Lewma 11 malbat ku hijmara wan 34 kes bûn di 16'ê Sbatê de amadekariyên xwe kirin û ji kampa Roj derketin û ber bi welatê xwe ve çûn.

**Xeteriya hebûna wan di vê demê de**

Kempa Roj li gor kampa Holê heya astekî kontirolbûna wê baştire, ji ber ku di milê meznahiyê de kampa Roj ji ya Hol piçûktire û di milê cih cografî jî kampa Roj cihê wê arame û tevlîhevî lê nînin. Berûvajî wê cihê kampa Hol di milê cigrafî de cihê şaneyên DAIŞ'ê ne heya roja îro. Lê xeteriya van kesan û derketina wan ji kempê heye, ji ber ku hijmarek baş ji wan heya niha jî bi îdolojiya DAIŞ ve girêdayîne û zarokên xwe jî li ser heman zihniyetê mezin kirine û ew kirine wek tovikê avakirina DAIŞ a nû. Di dema îro de tê dîtin ku DAIŞ dixwaze xwe ji nû ve avabike û xwe bihêztir bike û ev yek ne tenê metirsiyê li ser gelê kurd çêdike lê li ser tevahî cîhanê jî çêdike. Raste hedefa wan ya esasî tunekirina gelê kurde Ji ber ku li ser destê kurdan hatin şekandin û dewleta wa ya islamî rûxiya. Lê vejîn kirina DAIŞ di vê pêvajoyê de wê encamên gelek bi êş bi xwe re bîne.

# 'Bi êrişan nikarin îradeya me bişkînin'

**Stêrk Mihemed/Tirbêsipiyê**

**Dayîkên Tirbêsipiyê diyar kirin ku li ser banga Rêveberiya Xweser ku di 18'ê Çileyê de seferbari ilan kir heta niha ew li kolana, parastina bajarê xwe dikin û wiha gotin: "Bi êrişan nikarin îradeya me bişkînin. Em ê canê xwe û yê zarokên xwe jî bidin û em nahêlin ku dijmin pêş de werin."**

Di 6'ê Çileyê de Hikumeta demki ku dewleta tirk û hêzên hegemon piştgiriya wî dikir bi awayek hovane êrişê herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê kirin. Piştê Helebê raste rast berê xwe dan qadên ku ji Çeteyên DAİŞ'ê hatibûn rizgarkirin bi komployeke xwestin dagir bikin. Li ser banga Rêveberiya xweser ya ilankirina seferberiyê gelê Rojava ji 18'ê Çileyê ve ji heft heta heft salî beşdarê seferberiya giştî bûn. Taybetî jin ji wî seferberiya giştî re pêşengti kir çek rakir û di kolanan de parastina tax û mala xwe kir. Heya vî kêliyê jî parastina bajarên xwe dikin.
Di vê derbarê de dayîkên Tirbêsipiyê Xedîce Ehmed û Rehma Mele Beşîr ji Rojnameya me re axivîn.

**''Ez û hevjîn û kurê xwe bi hevre parastina bajarê xwe dikin''**

Xedîce Ehmed ku bi hevjîn û kurê xwe re di parastina bajarê Tirbespiyê de cîh digre got ku;"Ev zêdetirî 16 rojin em derdikevin parastinê. Rûxmê temenê min mezin jî buye, lê dîsa jî ji bo parastina bajarê xwe ez derdikevim kolanan. Em hertim li pişta zarokên xwe ne, çi dibe bila bibe em amadene, havin zivistan ji bo me ferq nake em ê li ser piyan û li kolana bin, heya ku em dighînin xwasteka xwe. Em ê giyana xwe û yê zarokên xwe jî bidin û em nayêlin ku dijmin pêş de werin. Herwiha em ê bi pêş de biçin û tu carî paş de venagerin."

**''Em deyndarê welatê xwe ne''**

Rehma Mele Beşîr destnîşan kir ku wan tabûrek bi navê Şehîd Rawan avakiriye û wiha domand: "Ji dema ku Rêveberiya Xweser seferberî îlankiriye, em weke jin û dayîkek Tirbêsipiyê xetê xwe digirin û bajarê xwe diparêzin. Îro şervanên me di çeperên şer de bi şev, roj di bin berf û baranê de parastian me dikin û qet nawestin. Herwiha em weke jin li pişta şervanên xwe ne, bila pişta şervanên me rast be. Îro dema ku dayîk destê xwe li pişta zarokê xwe dide û dibêje lawê min here xwedê bi re te be, dema zarokek bi çûk ji bavê xwe re dibêje bavo em hene, dema ku bav ji zarokê xwe de dibêje min sê parçe ji kezeba xwe dane îro ez deyndarê welatê xwe me. Bi rastî jî em dêndarê welatê xwe ne. Em tu carî nawestin û gave paşde na avêjin, baweriya me bi şervanên me heye, eger em Kurd yek bin, em tu carî nakevin û em ê bi serbikevin."



Xedîce Ehmed



Rehma Mele Beşîr

# ‘Şengal û Başûrê Kurdistanê di ihtîmala êrişan de ye’

Hevseroka MXDŞ Cîhan Celo diyar kir ku li Rojavayê Kurdistanê alozî bidomin, bê guman wê êriş li ser Şengal û li Başûrê Kurdistanê jî werin kirin, lewra gerek civak, keç û xurtên me seferberiya li Rojavayê Kurdistanê ji xwe re bikin mînak ku ew jî li ax, şervan û hêzên xwe xwedî derkevin, ji bo em dîsa rastî fermaneke din neyên.

**Ronahî Sadûn**

Piştê êriş û aloziyên ku li Rojavayê Kurdistanê rû dan, Rewşa Şengal û Başûrê Kurdistanê jî di metirsiyê de ye. Divê çarçoveyê de Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) Cîhan Celo bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Planek navneteweyî li ser gelê Kurd tê meşandin, hûn vê yekê çawa dinirxînin, bi taybet êrişên li ser Rojava sedemên xwe çibûn?**

Pêvajoya ku niha Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, pêvajoyeke pir giran e, bi taybet li ser kêmnetewên ku li vê erdnîgariyê jiyan dikin. Ev pêvajo bi zexta dewletên navneteweyî li ser gelên vê herêmê tê meşandin. Ji ber wê jî zor û zehemetiyên ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, bandora wê li ser gelên ku tê de jiyan dike, heye. Ev komplo û êrişên li ser van kêmnetewan têne kirin, ne ji niha ve dest pê kiriye, lê ji destpêka dîroka Kurdan ve komplo û êriş li ser vî gelî heye. Ji ber wê gelê Kurd her tim bi berxwedaniya xwe hatiye naskirin. Herwiha piştî derketin û belavkirina fikrê Rêber Apo yan jî avakirina PKK’ê, gelê Kurd bûn xwedî rol û statuyek ku navê wan li cîhanê hat belavkirin. Lê ev êrişên ku niha li ser gelên Sûriyê tê meşandin bi taybet gelê Kurd, berdewamiya kompoya sala 1999’an ku wê demê çawa xwestin fikrê azadiya Kurdistanê, gelê Kurd an jî mafê gelê Kurd di wir de bifetisîne, niha jî wisa dixwazin. Komploya li ser Rêber Apo hat kirin, rêbertî bi destê dewletên navneteweyî hat girtin û xistin zindanê de, eyînî ew dewletên ku wê demê ew komplo li ser Rêbertî meşandin, niha jî komplo li ser gelê Kurd ên li Rojavayê Kurdistanê didin meşandin ku di ecamê de ewqas şehîd çêbûn. Lewma bêhêvîtî ji aliyê gelê Kurd li hemberî van dewletan hat nîşandan, lê berxwedanî hat kirin.

Di van êrişan de keda QSD’ê ya ku 14 salan daye, li herêmên wek Reqa,Tepqa û Dêrezorê ji aliyên hindek kesên Ereb ve xayîntî lê hat kirin, taybet ji gel û eşîrê wê herêmê û ji Kûalîsyona Navnetewî ve jî xayîntî lê hatin kirin. Lê yekîtiya Kurdan di wê rewşa ku Rojava di nav tirs û hêviyê de mabû derket holê, her kes li seferberiya ku Rêveberiya Xweser ragihand ji bo xwedîderketina li Rojavayê Kurdistanê, xwedî derket, ev yek jî hemû hevsengî guhertin ku hişt her kes li gelê Kurd xwedî derbikeve. Herwiha zanibin ku êriş li kîjan parçeyê Kurdistanê ser çi destkeftiyên Kurdan were kirin û keda şehîdên Kurdistanê werin tunekirin, wê gelê Kurd bi milyonan rabû. Ji ber wê jî niha em dibînin êrişên hat kirin, rawestiyan û hikumeta colanî bê çare bû lihevkirinê bike, ne ji ber ew dixwestin, lê wan hêzek dît derveyî hêza leşkerî ew jî hêza gelê Kurd a li welat û derveyî welat e, dîtin ku gelê Rojavayê Kurdistanê ne bi tenê ye. Ji ber wê jî ev berxwedanî dîsa gelê Kurd bi serxist. Ya herî girîng em karin bêjin dibe ku di aliyê siyasî de hinekî firkir ji hevdû cuda bin, em a gel bi hev re rabûn. Bi taybet tevlîbûna keç û xurtên Başûr, Bakur û Rojhilat li seferberiya hate ragihandin û xwîna vî gelî nav hev dû de hat dayîn ji bo parastina bajarê Kurdan, dîsa yekîtiyek hat avakirin ew yekîtî wê were parastin, ji ber ku xwîn bi hev dû re hatiye rijandin.



**Çeteyên DAIŞ’ê yên ku niha ji bo Iraqê tên veguhestin, ev çete li ser gelê Şengal, Kerkûk û Mexmûr metirsiyeke çawa dide avakirin?**

Komploya navneteweyî ya ku li ser Rêber Apo bi destê dewleta Tirk û gelek dewletan ve hat kirin, bi heman armancên wê kompoyê, niha jî bi destê hikumeta demkî ya Sûriyê êriş li ser gelê Kurd tên kirin, herwiha ne tenê êriş in, di heman demê de ferman û qirkirin li ser gelê Kurd tê plankirin. Lê ji bo seferberiya Rojavayê Kurdistanê ku gelê Kurd li tevahîya Kurdistanê û li derveyî wê rabûn, hevsengî guhertin hiştin ku her kes li gelê Kurd xwedî derbikeve, encam jî li ber çave, êriş li ser heremên Kurdan hat rawestandin. Lê ji nû ve avakirina DAIŞ’ê û zindîkirina wê hem li Sûriyê, hem jî veguhestina wê ji Sûriyê ber Iraqê ve, xeteriyên wê li ser gelê Kurd ê Başûrê Kurdistanê heye, bi taybet ji bo Şengalê. Ji ber tola DAIŞ heye ku ew hewl bide tola xwe ji Şengalê hilîne, lê wê êriş bi çi awayî li ser Şengalê bê kirin ne diyare. Dibe ku DAIŞ ne bi rengê hovitiya di 2014’an de li ser Şengal were, ji ber di sala 2025’an de efuya giştî ji aliyê hikumeta Îraqê ve hat derxistin û ew insanên ku di zindanê de heta bi DAIŞ jî di wê efuyê de hat derxistin, herwiha gelek kes di nav hêzên leşkerî yên dewleta Iraqê de, fikrê DAIŞ hembêz dikin. Lewra dibe ku êrişên li ser Şengal were kirin, ne bi destê hêzên terorist be, lê dibe ku hikumeta Îraqê bi ser gelê Şengalê de bê. Ev êriş jî wê li ser îrade û hêza ku di Şengal de hatiye avakirin, taybet hêza ku li hemberî DAIŞ’ê şer û berxwedanî kiriye û şehîd daye, DAIŞ di vê derê de têk birin werin kirin. Em a ew li hêviya encamên lihevkirina di navbera hikumeta Colanî û Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê ne. Li Rojavayê Kurdistanê alozî derbikevin, bê guman wê êriş li ser Şengal û li Başûrê Kurdistanê jî bikin.

**Berxwedana gelê Kurd di vê qonaxa niha de di çi astê de ye û pêwîst e ji bo her rewşekê amadekariyên gelê Kurd çi be?**

Berya hertiştê lazime yekîtiya Kurdan were avakirin, da ku Kurd hemû bi hev re li hemberî her êrişeke ku li ser wan tê, bisekinin û li hev xwedî derbikevin. Em gelê Êzidî her tim para me di êriş, qirkirin û fermanan de duqatî gelê Kurd ên misliman e. Ji ber carekê bi navê ol û baweriya me êriş li ser me hat kirin, carek din jî ji bo zimanê me, vê carê jî heger êriş li ser Şengal û gelê wê were kirin, bê guman li vê derê yê ku di 2014’an li me xayîn ketin, dîsa li derdora Şengal hene, lewma wekî çawa li Reqa, Dêrazorê û Tebqa xayîntî li şervanên QSD’ê û li Rêveberiya Xweser hat kirin, li vê derê jî bi wî awayî were kirin. Ji ber wê jî pêwîst e gelê me niha xwedî li hêzên xwe yên Êzîdî derkevin, ji ber ên vê axê biparêzin keç û xurtên Êzîdiyan e. Em nikarin pişta xwe bi hêzên ku niha li ser sînorên Sûriyê û Îraqê hene, girê bidin, ji ber 2014’an bi hezaran hêz di vê derê de hebûn, em a ew hêz gel di nava lepên dijmin de hiştin, herwiha Ihtîmala ku êriş ji aliyê wan hêzan ve li ser vê civakê were kirin jî, heye. Lewra gerek civak, keç û xurtên me seferberiya li Rojavayê Kurdistanê ji xwe re bikin mînak ku ew jî li ax, şervan û hêzên xwe xwedî derkevin, ji bo em dîsa rastî fermaneke din neyên.



## Menuya Komplogeran

Farûk Sakik

6’ê Çileyê dema pêla êrişên HTŞ û çeteyan ku li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê dest pê kir û piştre xwestin li tevahiya Rojava belav bikin, kompoya navneteweyî derbasî qonaxeke nû dibû. Piştî êriş û berxwedana deh rojan, 16’ê Çileyê çete li Deyr Hafirê bûn û dixwestin van êrişên xwe li seranserê Rojava belavbikin. Di demek wiha de QSD’ê biryar da ku wê ji heremê vekişin, derbasî Rojhilatê Firatê bibin. Di demek wiha de 18’ê Çileyê li Hewlerê civînek di navbera Amerîka û Kurdan de pêk hat. Peymanek ku ji 12 xalan pêk dihat li ser masê bû. Di kêliyên ku ev peyman dihat nirxandin de, xebera ku li Deyr Hafirê komkujiyan dest pê kiriye hat. Hêzên HTŞ’ê li gor lihevkirinê tevnedigeriyan. 19’ê mehê li Şamê dema civîna lihevkirina peymana 18’ê Çileyê bûn, Tom Barrack bi helwesta xwe dida xuyakirin ku di Kompoya duyem de erkdar e. Daxwaza Mazlûm Ebdî ya seknandina van êrişan red dikir. Zextan dida ku peymana teslimiyetê bide îmzekirin.
Li hemberî hemû gef û bêedebiyê Mazlûm Ebdî got; ez ê herim gelê xwe biparêzim.
Rêber Apo di 9’ê Cotmeha 1998’an ji Şamê derket, Mazlûm Ebdî jî bi wê helwestê 19’ê Çileyê ji Şamê derket. Rêber Apo derbasî Ewrûpa bû li çareseriya dopirsa Kurd geriya. Tom Barrackê demê Clinton li Ewrûpa bi du Rêber Apo ketibû û dixwest pêşî li lêgerîna çareseriya pirsa Kurdistan bigire. Dixwest ku dewletên Ewrûpa li Abdullah Ocalan xwedî dernekevin. Lê Kurdistaniyên Ewrûpa li Roma li dora Rêber Apo xelekek parastinê çêkirin.
Mazlûm Ebdî dema ji wan re got; “Ez teslimiyetê qebûl nakim” û vegeriya Kurdistan, seferberî hat îlankirin. Li derveyî bajaran şervan, di nav bajaran de herkesî çek girt û li seranserê cîhanê Kurd, Kurdistanî û dostên wan daketin qadan. Herkes di nobeda parastina Rojava de bû.
Li qadên berxwedana parastina Rojava her wek ‘Kongreya Neteweyî ya Kurdistan’ hat lidarxistin. Herkesî aliyên xwe yên siyasî, rêxistinî, partî û kesayetî danîn aliyekê û bi yek deng û rengî li kolanan bûn. Rêber Apo jî li Îmrali bi pêşbînî şerê hêzên kompoger yê ku dixwazin di navbera gel, bawerî û mezheban de bidin destpêkirin, dît. Midaxlekir. Ji bo pêşîgirtina kompoyê, biryara peymana 30 Çileyê da.
Dema Kurdan li qadan kongreya xwe ya yekîtiya Netewî pêkanîn, hêzên navnetewî jî ketin nav liv û tevgerê. Zext dan ser hikumeta Şamê da ku li gor peymana 30’yê Çilyê tevbigere.
Kurd bi têkoşîna xwe ya salan a li dijî Komployê bûbûn xwedî ezmûnek. Dîsa gel û Rêber Apo ev komplo jî vala derxistibûn. Pêşî li şerê nav gelan girtibûn. Rojava ji felaketên mezin parastibûn. 14 roj piştî vê peymanê di 13’ê Sibatê de ji balefirgeha Hewlêrê, ji rêveberiya xweser 2 rêwî di balafira Munîhê de bûn, ew jî Fermandarê Giştî yê QSD’ê Mazlûm Ebdî û Hevseroka Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ehmed bûn.
Belê Konferansa ewlekariyê ya li Munîhê bûn. Konferansek gelek girîng ku ji lîderên gelek welatan, serokomar, serokwezîr beşdarî vê konferansê dibin. Mazlûm Ebdî û Îlham Ehmed jî li vê konferansê bi van lîderanre civîn lidarxistin û hevdîtin pêkanîn.
Di civîna Davosê de, Serokwezîrê Kanadayê Mark Carney, bersivek waha dide gefên Trump; “Hêzên hevbeş divê bi hev re tevbigerin, ji ber ku heke em ne li ser maseyê bin, emê di menuyê de bin” Têkoşîna Rêber Apo ya 27 salan Kurd ji menûya Komployê derxistibû û li Munîhê, li dora masê dabû rûniştandin.



# ‘Hebûna pirtûkxaneya Kurdî li pêşangeha Şamê gaveke girîng e’


Hevserokê Desteya Çandê ya kantona Cizîrê Ilyas Sîdo diyar kir ku hebûna beşek ji pirtûkên bi zimanê Kurdî li Pêşangeha Pirtûkan a Şamê weke cara yekem bingehek girîng a çandî ye û got, “Baskê Kurdî wekî insiyatîfek ji aliyê Wezareta Çandê ya Sûriyê ve, ne wekî insiyatîfek hevbeş an vexwendinek rasterast ji bo desteyên fermî yên Kurdî ye.”

**Reşo Mihemed/ Hesekê**

Pêşangeha Şamê ya Navdewletî û vekirina beşekî taybet a pirtûkên zimanê Kurdî mijareke bingehîn û cihê nîqaşê ye di nav rewşenbîr, nivîskar û civakê de ye, derbarê heman mijarê hevserokê Desteya Çandê ya kantona Cizîrê Ilyas Sîdo bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Di 6’ê Sibatê de Pêşangeha Şamê ya Navdewleît li ser asta 10 rojan dest pê kir, tê de jî beşek taybet a Pirtûkên Kurdî hat vekirin û pêşandan, gelo hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Pêngava veqetandina baskek ji bo pirtûkên bi zimanê Kurdî li Pêşangeha Pirtûkan a Navdewletî ya Şamê ji bo cara yekem bingehek girîng a çandî ye ku dikare bandorek berfireh li ser astên civakî, çandî û siyasî li Sûriyê û herêmê bike. Hebûna baskekî ji bo pirtûkên Kurdî li pêşangehek li Şamê pejirandineke eşkere ya hebûna çand û zimanê Kurdî wekî beşek ji tevna çandî ya welêt e. Ev naskirin di hawîrdorekê de girîng e ku tê de, di dîrokê de, zimanê Kurdî her gav beşek girîng a qada giştî nebûye. Baskekî wisa ne tenê ji bo temaşevan re xizmetê dike, lê beşdarî dike ji Nasandina çanda Kurdî ji bo kesên ne Kurd bi rêya gihîştina xwendevanên Ereb û yên din bo pirtûkên wergerandî an berhemên orîjînal. Teşwîqkirina danûstandinê di navbera çandên cihêreng ên Sûriyê de çêdike. Ev yek têgihîştinê pêş dixe û tenêtiya çandî kêm dike. Ew asoyên berfirehtir ji bo nivîskar û helbestvanên Kurd vedike da ku di qadeke navneteweyî de derkevin holê. Ew teşwîq dike ku bêtir xebat û lêkolînên bi zimanê Kurdî werin weşandin. Her çend bûyerên çandî xuya bike jî, aliyên wê yên siyasî yên nerasterast hene û gavek ber bi naskirina nasnameya Kurdî di nav dewleta fermî ya Sûriyê de. Ev dikare wekî hewldanek ji bo entegrekirina pêkhateya Kurdî di diyalogên neteweyî de piştî salên nakokiyên li ser polîtîkayên ziman, perwerdehî û çandî were şîrovekirin. Bask dikare bibe xala destpêkê ji bo komxebatên hevbeş di navbera rewşenbîrên ji paşxaneyên cuda de ji bo wergerandina berheman






ji zimanên Erebî û Kurdî û berevajî vê. Ji bo pêşxistina hevkariya di navbera weşanxaneyên Sûriyê û weşanxaneyên Kurdî yên ji Îraq, Tirkiye û Îranê de, gaveke girîng e. Eger weşanxaneyên Kurdî beşdar bibin, baskê pêşangehê bi zimanê Kurdî dikare bibe navendeke balkêş ji bo kesên ku bi wêje û lêkolînên akademîk re eleqedar dibin. Ev destpêşxerî dikare bibe platformek birêkûpêk ji bo weşan û wergerandinê. Herwiha derfetên ji bo projeyên çandî yên Kurdî di nav bername û pêşangehên piştgiriya pirtûkan ên navdewletî de dema bi fermî weşanxaneyên Kurdî beşdar bibin hêsan dike. Baskê Pirtûkên Kurdî li Pêşangeha Navdewletî ya Şamê ne bûyerek derbasbûyî ye; berevajî vê, ew gaveke stratejîk a çandî û civakî ye ku di hundirê xwe de xurtkirina pêşvebirina pirrengiyê, piştgiriya wêjeya Kurdî û vekirina rê ji bo diyalogek kûrtir di navbera pêkhateyên cihêreng ên li Sûriyê û derveyî wê de dihewîne. Ew nimûneyeke ku çawa bûyerên çandî dikarin bibin amûrên guhertinê û ji bo avakirina piran di navbera çandan de.

**Wekî tê zanîn ev beş ji hêla hin weşanan an jî kesên nivîskar ve hatiye vekirin, gelo çima vexwendin ji Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê an ya kantona Cizîrê an jî weşanên fermî yên Kurdî, hem jî Yekîtiyên Rewşenbîrî re nehatiye (siyaseta hikumeta demkî di vê derbarê de çawa tê dîtin)?**

Baskê Kurdî wekî înîsiyatîfek ji aliyê Wezareta Çandê ya Sûriyê ve di çarçoveya Pêşangeha Navdewletî de hate organîzekirin, ne wekî înîsiyatîfek hevbeş an vexwendinek rasterast ji bo desteyên fermî yên Kurdî ye. Ew beşek ji hewldaneke ji bo nîşandana cihêrengiya çandî di bin rêveberiya navendî de. Tevî fermana ku ziman û çanda Kurdî nas dike, têkiliyên siyasî yên di navbera hikumeta navendî ya li Şamê û dezgehên Kurdî (wek Rêveberiya Xweser an desteyên wê yên çandî) de hîn jî gumanbar û nakok in. Aliyên Kurd nûnertiyeke siyasî û çandî ya berfirehtir û mafên destûrî yên kûrtir dixwazin ku ji beşdariya sembolîk a li standeke pêşangehê wêdetir biçin. Rexne hene ku saziyên navendî gavên sembolîk diavêjin bêyî ku van desteyan roleke çalak di çêkirina polîtîkayê de an jî di organîzekirina çalakiyan de di çarçoveya hevkariyeke rastîn de bidin .Nebûna vexwendinekê ji bo saziyên fermî yên Kurdî an beşdariya rêxistinî ya rastîn nîşan dide ku siyaseta çandî ya hikumeta demkî ya li Şamê hîn jî li gorî nerînên navendî tê birêvebirin û pirrengiyê wekî rûyekî nîşan dide ne wekî hevkariyek saziyî ya rastîn dide pêş. Ev nîşanek ji rewşa siyasî ya berfirehtir e, ku tê de têkiliyên di navbera rayedarên navendî û desteyên Kurdî de hîn jî di pêvajoya danûstandin û diyarkirina hevbeş a rol û statuya destûrî de ne.

**-Heta ku çanda Kurdî ya resen, pê re jî zimanê Kurdî ji wiha bêhtir bikeve warê fermiyetê de, weşanên fermî yên Kurdî yên Rojava tevlî pêşangehan bibin, gelê Kurd bi rengê ku ew dixwazê perwerdeyê bibîne û wêjeya xwe li pêş bixe, erka ku dikeve ser milê saziyên çandî li Rojava çi ne û pêwîst e hikumeta Şamê çi gavan bavêje?**

Rola saziyên çandî li Rojava dezgehên çandî çi fermî bin çi jî civaka sivîl dikarin di pêşvebirina çand û zimanê Kurdî de li ser bingehên saxlem û domdar rolên girîng bilîzin, dikare bi rêya belgekirina dîroka devkî û folklorê (stran, çîrok, merasîm, muzîk piştgiriya weşangeriya Kurdî pirtûkên wêjeyî, zanistî, dîrokî û perwerdeyî. Hem jî avakirina weşanxane û pirtûkxaneyên pispor ên li ser çanda Kurdî. Li aliyekî din wergerandinê ji û bo zimanê Kurdî ber bi zimanên çandên din girêdide. Di heman demê de bernameyên hînkirina zimanê Kurdî li dibistan û zanîngehan û perwerdekirina mamosteyan li pêş dixe. Herwiha lidarxistina pêşangehên pirtûkan û festîvalên hunerî û wêjeyî yên ku çanda Kurdî derdixe pêş. Li aliyê din jî hevkariyê di navbera çandên cuda yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Kurd, Ereb, Suryanî, Asûrî…) de, ji bo civakek piralî û wekhev ava dike. Gavên girîng ên ku hikumeta demkî avêtine piştgiriya ziman û çanda Kurdî dikin. Eger xwestekeke rastîn ji bo naskirin û pêşketinê hebe, kiryarên berbiçav ên hikumetê dikarin ev bin: Naskirina fermî ya zimanê Kurdî. Bila Kurdî li herêmên ku piraniya wan Kurd in, ligel Erebî, bibe zimanekî fermî. Derxistina qanûnekê ji bo rêkxistina karanîna zimanê Kurdî di rêveberî, perwerde û medyayê de. Maf û beşdarbûn di weşan û pêşangehan de. Vekirina pêşangehên pirtûkan ên fermî ji bo weşanxaneyên Kurdî bê cudakarî. Piştgiriya weşanxaneyên Kurdî ji hêla darayî û teknîkî ve ji bo beşdarbûna di çalakiyên çandî yên navdewletî de. Destûrdayîna zanîngeh û peymangehên taybet û giştî ku bernameyên perwerdehiyê bi zimanê Kurdî vekin. Di heman demê de tevlîkirina rewşenbîr û nûnerên Kurd di komîteyên çandî û perwerdeyî de di asta wezîran de. Avakirina diyalogeke vekirî li ser polîtîkayên çandî û zimanî di navbera Şam û nûnerên civaka Kurdî de. Hem jî naskirina fermî ya şûnwar û mîrata çandî ya Kurdî wekî pêkhateyek ji mîrata neteweyî ya Sûriyê.

## Têbînî



### pêşangeha pirtûkan a Şamê û belengaziya hin rewşenbîrên kurd

Kemal Necim

Di hefteya borî de li Şamê pêşangeha Pirtûkan a Şamê hat lidarxistin. Lidarxistina pêşangehê bi xwe ne bûyerke balkêş ya nû bû, lê tişta nû di pêşngeha îsal de ew bû ku qaşo beşekî bi navê Beşa Kurdî hebû.
Ji xwe wek rotîn û protokol, di pêşangehan de tiştekî wilo nayê kirin, ango nayê gotin ev beşê pirtûkên bi filan zimanî ne yan ên filan neteweyê ne, ev kategoriyeke wiha li pirtûkxaneyan tê bikaranîn, lê li pêşangeha tişta asayî ew e ku weşanxane beşdar bibin, êdî ew weşanxane dibe ku bi çi zimanî bin.
Ji xwe beşê kurdî li pêşangehê tiştekî wilo qels û kêm bû ku xuya bû tenê ji bo propagandayê bû ku desthilata Şamê dixwaze xwe li pêş raya giştî nîşan bide ku êdî kurdan nas dike. Li wî beşî weke ku yekî kurd ê nêzîkî desthilatê çend pirtûkên ku li ba wî hene anîne û danîne ser maseya beşê kurdî. Ya rastî pirtûkên ku carê nivîskarê kurd Salihê Heydo li maseya xwe ya li pêşangeha şehîd Herekol a li Qamişlo datîne ji pirtûkên beşa kurdî ya pêşangeha şamê zêdetir bûn.
Armanca desthilatê pir eşkeer û diyar bû û xuyaye ku hin rewşenbîrên kurd ên belengaz jî bûn amûrên wê armancê û çand, ziman, weşangeriya kurdî û afrênerî û dahênana bi zimanê kurdî ewqas qels û lawaz nîşan dan. Tevî ku her kes dizane ku di 15 salên dawiyê li Rojava bi hezaran berhemên bi zimanê Kurdî hatine çapkirin û weşandin û çend weşanxaneyên çalak hene ku salane bi sedan pirtûkan diweşînin.
Li Pêşangeha Pirtûkan a Şamê û veqetandina beşekî ji bo pirtûkên kurdî, hevdemî rewşeke pir aloz û hestyar de pêk hat. Li Rojava hîna rewşa seferberî heye, hîna şûnamayên şerekî dijwar ku rû da li erdê ye, hîna sûc û kiryarên hovane yên hêzên desthilata şamê di rojeva xelkê de ne, her roj nasnameyên şehîdên nû têne eşkerekirin, bi deh hezaran koçber di stargehan de ne, bajarê Kobanê di bin dorpêçeke giran a hêzên Şamê de ye. Di van şert û mercan de vekirina beşekî bo pirtûkên kurdî li Şamê bûye weke pêkenokeke reş û hewldaneke ji bo rewakirina kuştin û birçîkirina kurdan.
Ev reftar û hewldana qels a desthilata Şamê ya ji bo biçûkxistin û kêmkirina nasnameya çandî ya kurdan, ji hêla derdorên nivîskar û rewşenbîrên kurd ve nehat pejirandin. Lê tevî wilo jî hin rewşenbîr, nivîskar û siyasetmedarên kurd bûn amûra vê pêkenoka reş.
Hin rewşenbîrên, qaşo kurd, hemû nirx û pîvanên kurdbûnê û mirovbûnê binpê kirin û weke mêvan berê xwe dan wê pêşangehê û pirtûkên xwe yên ku bi zimanê Erebî, ne Kurdî, nivîsîbûn imze kirin. Wan rewşenbîr û siyasetmedaran hemû rexne û şermezarî paşguh kirin û bi awayekî pir arzan bûn amûr û alava rewakirina komkujiyan û spîkirina rûyê desthilata Şamê ya ku heta niha bi awayekî destûrî zimanê kurdan nas nake.
Di rewşeke wiha de mirov dikare tenê navekî li wan nivîskar û rewşenbîrên ku xwe avêtin ber lingên desthilata şamê bike, ew jî ew kesên “belengaz” in.

# Gelê Sûriyê di bin barê bihabûnê de pêşwaziya Remezanê dike

Di bazara Sûriyê de pêleke ji bihabûna madeyên sereke yên xwarinê bi nêzîkbûna meha Remezanê derketiye holê, ev yek jî ji salekê bo saleke din barê welatiyan girantir dike, nemaze di çarçoveya rewşa jiyanî ya zehmet de ku Sûriyê bi giştî tê de derbas dibe.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bi nêzîkbûna meha Remezanê, zextên aborî li ser malbatên Sûrî yên ku hêza wan a kirînê sînorkirî ye zêde dibe. Bi taybet di çarçoveya pêla bilindbûna bebiçav a pêwistiyên xwarinê ya bilez di bazara Sûriyê de, ku şahidiyê pêleke bilindbûnê di bihayên sebze, fêkî û pêwistiyên din yên xwarinê de bûye, bi rêjeyeke bêhemapa ku gihaştiye rêjeya ji sedî 100, ku bi vê yekê hemû pêşbîniyên fermî yên aramiya bihayê destnîşan kiribû, pir zêdetir û derbas kiriye.

Di nava aloziya ku Sûriyê tê de derbas dibe, welatiyên Sûrî xwe di navbera qelsbûna qudreta kirînê û îstîsmarkirina baziragnan dibînin, di nava windabûneke tam ya çavdêriya temwînê ku hiştiye barê malbatan di meha Remezanê de girantir bike.

Serdanên rojane a malbatan ji bo bazarê veghuriye ezmûnekê li hember qidreta wan a kirîna pêwistiyên sereke yên xwarinê, ji ber ku lîsteya pêwistiyên meha Remezanê li şûna ku bibe rêûresmeke civakî ya naskirî bûye bareke aborî ya zêde.

Bazarên Sûriyê, li Şamê bi taybet rastiyek aborî bi bilindbûna nirxan ve ferz kiriye, lewma tê xuya kirin ku hemû madeyên xwarinê herwiha kelûpelên bingehîn bi nêzîkbûna meha Remezanê ya pîroz şahidiyê bihabûnê bûne.

**Bihayên xwarin û mûnetê**

Li gorî agahiyên ku ji hin malperan hatin girtin, tê xuyakirin ku madeyên sereke yên xwarinê ku li ser sifreya her malbatekê heye, rêjeyên bêhempa tomar kiriye.

Genim: Kîloya Savarê gihaştiye 85 lîreya nû ya Sûrî, lê bihaya savara pakêtkirî 95 lîreya nû ye. Li aliyekî din bihayê Birincê bûye bareke zêdetir ku kîloya “Birinca Golden” gihaştiye 135 lîre û ya pakêtkirî 145 lîre. Di heman demê de Birinca “Basmati” li ser lîsteya herî biha ye ku kîloya wê gihaştiye 180 lîre û ya pakêtkirî 190 lîreya Sûrî. Makeron bihayê wê gihîştiye 112 lîre, di bazarê de ya herî bi şok kîloya Firîkê ye ku bihayê wê gihaşt 300 lîre, herwiha onsek ji guza hindê 250 lîre û kîloya rûn 240 lîreya Sûrî ye.

**Madeyê temwîn û konservekirî bênavber zêde dibe**

Kêmasiya budceyê ne tenê li ser genim sekinî, lê lîsteyek dirêj ji pêdiviyên sereke yên xwarinê jî di nav xwe de girt:

Vexwarin û şekir: Bihayê kîloyek Metê gihaşt 560 lîreyan, kîloyek şekir bi 72 lîreyan, di heman demê de kîloyek nîsk bi bihayê 250 lîreyan tomar kiriye.

Rûn: Qûtiyek rûnê “Ona” bi 230 lîreyan e, lê bihayê lîtreyek zeyta zeytûnê yê herêmî gihîşt 750 lîreyan.

Kelûpelên konservekirî: Bihayê qûtiyek Sardînan gihaşt 90 lîreyan, qûtiyek Ton gihaşt 120 lîreyan û qûtiyek Martedêla (bi giraniya 400 gram) gihîşt 80 lîreyan.

Bihayên şêranî û pêdiviyên din bi awayekî berbiçav zêde bûne; kîloyek Helawê bi 450 lîre, kîloyek nîska pelçiqandî 130 lîre û nîska ji bo Micedera jî 180 lîre ye.

**Xerckirina rojane: Çayê û Qehwe**

Heta bi rêûresmên bêhnvedanê ji bihabûnê bandor bûye, bihaya kîloya Qehwê bi 1300 lîreyan û onseke Çayê bi 250 lîreya nû hatiye tomar kirin.

Bi vê sînaryoya bi êş û zehmet, amadekirinên meha Remezana pîroz ji rêûresmên civakî yê bi şad veghurî hevkêşiyeke aborî ya pir tevlihev, ku welatî xwe di navbera daxwazên vejînkirina rêûresmên meha pîroz û nikarîna qidreta wan ya kirînê, dibînin, di çarçoveya bilindbûna bihayan ku bûye astengiyek di peydakirina hêsantirîn pêwistiyên lazim.

**Kivark û fasûlî di asta jorîn de ne… Sebze û fêkî di bazarên Şamê de bilindbûneke nû tomar kiriye**

Di bazarên Şamê de ji ber pêla nû ya bilindbûna nirxên pêwistiyên xwarinê ku bandor li piraniya cureyên bingehîn ên sebze û fêkiyan kir, rewşek tevliheviyê derketiye holê. Bihayên ku bi berdewamî bilind dibin, lîsteya kirîna asayî ya welatiyan kiriye fikar da ku xwarinên xwe yên bingehîn peyda bikin.

Hate xuyakirin ku bihayên sebzeyên bingehîn astên bilidn tomar kiriye, bihayên wan wiha ne:

Cûreyên ku bihayên wan yên herî bilind ev in: Kîvark di lîsteya herî bilind de ye kîloya wê bi 750 lîre ye, piştre wê Fasûliyên kesk tê ku bi bihayê 250 lîre tê frotin û Bazêla 240 lîre tomar kiriye.

Sebzeyên bingehîn: Bihayê kîloyek Bacan 100 lîre ye, lê bihaya Kartol û Pîvazan aramî tê de heye ku di bihaya 60 lîre sekinî ye.

Xirtik û Bacanê Reş kîloya wan bi 120 lîreyan ne, Fûlên kesk gihaşt 150 lîre di heman demê de Pîvaz û Lehane bihayên wan di astên di navbera 40 – 60 lîreyan de ye.

**Bihayê fêkiyan**

Bihayên fêkiyan ji vê sînaryoyê dûrneketiye, lê ew jî hejmareke bilidn tomar kiriye ku bandorekê li ser welatiyan zêde kiriye:

Sêv kîloya wê bi 150 lîre ye, Birtiqal 120 lîre, Gezer 70 lîre û Şewender 40 lîreyan.

**Bihayên goşt**

Li gorî daneyên meydanî yên li bazarên gelêrî û bihayên ku li ser medyaya civakî hatine weşandin, bihayên goştê sor di lîsteya xwarinên herî biha de ne, ku ew hêza kirînê ya piraniya malbatan derbas kiriye.

Ji bo gelek malbatan, bihayê goştê sor bi hemû cûreyên wê di navbera 140 û 180 hezarî de ye.

Bihayê goştê mirîşkan di navbera 22 hezar heya 49 hezaran e.

Bihayên gotş ji deverekê bo ya din tê guhertin herwiha ji firoşgehekê bo firoşgeheke din di heman bazarê de, ev yek nebûna lêvegereke bihayê ya zelal nîşan dide.

**Sedemên bilindbûna bihayê di meha Remezanê de:**

Aborînas dibînin ku di meha Remezanê de bi gelemperî ji ber zêdebûna daxwaza xwarinê û zêdebûna xerckirina malbatan bihayên pêwistiyên xwarinê zêde dibin.

Di nav van sedeman de, meha Remezanê wekî demsala bazirganî tê hesibandin ku tê de tevgera firotanê zêde dibe, ji bilî vê yekê biryarên qedexekirina derbaskirina hin cureyên sebze, fêkî û mirîşkên cemidî, ku bû sedema zêdebûna girêdayîbûna bi berhemên herêmî, lewma di encamê de bihayên pêwistiyan bilindtir dibin. Di heman demê de yek ji sedeman guhertinên bilez a bihayên Serfê, bilindbûna lêçûna veguhestin û enerjiyê, zêdebûna daxwazên demsalî berî Remezanê, qelsbûna hilberîna herêmî ya hin berheman di encama bilindbûna lêçûna pêwistiyên çandiniyê û bilindbûna bihayên derbasbûna berhemên cîhanî bi taybet Zeyt û Şekir.

**Sal bi sal qelsbûnek berbiçav di qidreta kirînê de tê destnîşan kirin:**

Ji sedî 80 û 150 di hin pêwistiyên bingehîn yên meha Remzanê de bilindûna bihayan hatiye destnîşan kirin. Pisporên di vî warî de destnîşan dikin ku mûçeya navînî, ku par nêzîkî ji sedî 50’ê pêdiviyên meha pîroz pêk dianî, niha bi zorê ji sedî 20 pêk tîne.

Tiştê ku em li ser refikên sebze û fêkiyan li parêzgehên Sûriyê dibînin ne tenê mijara bilindbûna bihayan e; lê ew nîşaneya aloziyeke aborî ya berdewam e ku rastiyeke dijwar li ser gel ferz dike. Tevî vê yekê, gelê Sûriyê israr dikin ku xwe bi pêdiviyên jiyana xwe ya rojane ve girêbidin, hewl didin ku dahata xwe ya sînordar bi lêçûnên jiyanê yên her ku diçe zêde dibin re hevseng bikin.





# Yekîtiya Kurd wê ruhê Şoreşa Rojava biparêze

Gelê Kurd li hemberî zor û zilma desthilatdaran agirê şoreşê gur kirin, berdêlên giranbuha dan û serî ne çimandin. Îro jî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ya ku gelê Kurd bo doza xwe lidarxistinbûn rûbirûyî metirsiyên mezin in, ji ber ji her alî ve plan li ser têkçûna wê ve tên meşandin, lê yekîtiya Kurdan rê li ber vê yekê girt û serkeftin tacîdar kir.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Şoreşa Rojavayê Kurdistanê**

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê di 19’ê Tîrmeha 2012’an de li Kobanê dest pê kir û bi gel û şervanên Kurd li tevahî Rojavayê Kurdistanê pêlên wê belav bû. Ev dîrok nayê wateya ku beriya wê yekîtiya Kurdan ne bû, lê bi pêlên şoreşê re yekiti hevgirtina kurdan xortir bû. Lê di vê dîrokê de Kurd li hemberî sîstema desthilatdar a Sûriyê rabûn ser piyan û êdî dest pê kirin ku wan ji warê xwe derxînin û zilama wan bidin şikandin. Herwiha Şoreşa Rojava di bingehê xwe de, şoreşeke civakî bû ku jinê pêşengtî jêre kir. Di heman demê de ew rêya ber bi guhertinên salan ji hişmendî, desthilatdarî, jiyanî û hwd…e. Lewma di nava van salên dûr û dirêj yên şoreşê ne, gelek guhertin û veguhertin pêk hatine ku li Rojava sîstema rêvebirênê bi rêjeya sed ji sedî guherî ye, sîstema hevserokatî, wekheviya zayendî û pêkhatiye lê tê jiyankirin, têgehên nijadperestî, netewperestî, zayendperestî ji holê hatine rakirin. Ev jî destkeftineke mezin a ku bi berdêlên giranbuha heta roja îro hatiye.

**Çima şoreşa Rojava?**

Şoreşa Rojava bi îradeya gelekî ku doza mafê xwe dikir derket pêş, ne ku gelê Kurd doza axên gelên dîtir dikir. Di nava vê şoreşê de keç û xortên Kurd hêza xwe ya YPG û YPJ’ê dan avakirin, da ku bergeriyê li ber xak, namûs û welatê xwe bikin. Bi salan û heya roja îro jî van şervanan “Gel û herêma” xwe ji hemû êriş û qirkirina diparastin. Herwiha di encama keda şervanên Kurd û şervanên pêkhateyên din de, serkeftineke ku di dîroka giştî cîhanê de nehatiye jiyankirin pêk hat, serkeftin jî ew bû ku şervanên YPG, YPJ û QSD’ê çeteyên DAIŞ’ê yên di cîhanê de naskirî ne bi hovitiya xwe, têk birin. Şervanên Kurd bi hêza xwe ya hevgirtî li hemberî hemû şert û mercên hatin jiyankirin û heya îro jî tên jiyankirin li ber xwe didin, tevî ku di gelek aliyan de cîhan hemû li hemberî wan bûne yek jî, lê gel û şervanên Kurd ne tenê DAIŞ têk dibe, her kes û dewletên ku destdirêjiyê li ser mafê wan bike wê wan têk bibe, ji ber ew amade ne ji bo parastin welatê xwe her tiştî bikin.

**Encamên Şoreşê**

Şoreşê rê li ber avakirina Sîstemek Xweser a Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya jinê vekir. Bi şoreşê re, îradeya gelên herêmê ji Kurd, ereb, Suryan, Tirkmen û hwd… hat xurtkirin. Di heman demê de Yekîneyên Parastina Gel û Jinê (YPG û YPJ)’ê li dijî çeteyên DAIŞ’ê serkeftinên mezin bidest xistin û tevahiya bajar û deverên ketibûn bin destê çeteyan de rizgar kirin. Herwiha bi ewlehiya herêmê re, aramî û ewlehiya cîhanî piştî têkbirina DAIŞ’ê misoger kirin. Li kêlek vê yekê rola jinan di hemû qadên jiyanê de mîna siyasî, leşkerî, rêveberî, civakî û hwd… de wekhev hat pejirandin. Ya girîng jî perwerdeya bi zimanê dayikê Kurdî, Erebî, Suryanî di dibistanan de bû mafeke bingehîn ên xwendekaran. Li kêrleka van jî gelê Rojava sîstema xwe ya birêxistinkirinê xurt kirin, di warê xweparastinê de xwe perwerde kirin û Şerê Gelê Şoreşgerî bingeh girtin. Jinên Kurd di Şoreşa Rojava de bûne sembola azadî û rûmetê, dîrokê ji nû ve diafirînin, sînoran dişkînin û pêşerojeke azad ji bo hemû gelê Kurd û jinên cîhanê ava dikin.



**Rola ciwanan di şoreşê de**

Rola ciwanan di Şoreşa Rojava de wekî pêşeng, parêzvan û avakerên civakake nû bû. Bi taybet ciwanên Kurd û pêkhateyên dîtir di nava Şoreşa Rojava de dînamîkên sereke ne. Herwiha ew ji bo pêşxistin û serxistina şoreşê roleke pir girîng lîstin û li ser vê bingehê jî rola wan tê berdewamkirin. Ciwan di qadên rêxistinî, bîrdozî, dîplomasî, hunerî û parastinê de çalak in, bi taybet jinên ciwan di nava şoreşê de rola pêşengiyê dilîzin û têkoşîneke bilin didin meşandin. Ciwan di parastina destkeftiyên şoreşê û ewlehiya herêmê de bi çalak û beşdar in. Lewma em dikarin bêjin ciwan bingehê şoreşê ne û bi xebatên xwe re şoreşê ber bi serkeftinê ve dibin.

**Li Rojava îro şoreş gahiştiye çi astê**

Di hundirê Şoreşa Rojava de gelek şoreşên din hatin lidarixstin, îro jî şoreş derbasî qonaxeke nû bûye. Bi guhertin û geşedanên li herêmê têne jiyankirin, ruhê şoreşê hîn xurtir û çalaktir bûye. Ji ber hikumeta demkî ya Şamê ku bûye saleke li ser desthilatdariyê ye, bi hêzên cîhanî re berê xwe da vê şoreşê û xwestin şoreşê têk bibin û gelê Kurd bi tunekirina sedsala 21’emîn re derbas bike. Lê hemû dinya dizane ku gelê Kurd heya niha dev ji mafê xwe bernedaye û bernade. Heya niha li hemberî tu hêzan serî netewandî ye û berxwedanekî bêhempa nîşan dide. Berxwedana gelê Kurd di avakirina saziyan de û berxwedana hêza YPG û YPJ’ê berxwedanekî efsûnî ye. Şoreşa îro li Rojavayê Kurdistanê ji bo gelê Kurd tiştekî pir hêja û watedar e. Ji ber xwe bi xwe rêvebirin ji bo gelê Kurd xeyala bi sedê sala ye. Her çiqasî li hemberî vê şoreşê şer bê kirin jî, lê tekez wê bi yekbûna gelê Kurd têk biçe, wekî ku îro ev yek hat jiyankirin.

**Parastina destkeftiyên Rojava, parastina Kurdistanê ye**

Rewşa heyî ya li Rojava ne tenê qeyraneke herêmî ye, rûbirûbûneke dîrokî ya ‘hebûn û tunebûnê’ ya gelê Kurd e. Êrişên li dijî destkeftiyên Şoreşa Rojava ew êrişên rasterast ên li ser hebûn, rûmet û mafên rewa yên neteweya Kurd e. Lewma heta ku Kurd nebin yek dê li Kurdistan û Rojhilata Navîn bê parastin bimînin. Parastina destkeftiyên Rojava, parastina hêviya hemû parçeyên Kurdistanê ye. Ji bo wê ger ku Kurd weke netewek nebin yek deng, yek helwest û yek rêxistin, ew ê di nav Rojhilata Navîn de di bin metirsiyê qirkirinê de bimînin. Lewra pêwîst e ruhê yekîtiyê yê li her çar aliyên Kurdistanê ji bo Rojava derket holê, bê parastin û her dem bi wî ruhî têkoşîn bê meşandin. Niha jî di encama her tiştê ku tê kirin, berxwedana hebûn û rûmetê li seranserî Rojavayê Kurdistanê tê domandin. Şerê Gelê Şoreşgerî di asteke bilinde ketiyê meriyetê ku gel bi şervanên xwe re bi şev û roj parastinê dikin.

# ‘Gelê Kurd wê bi yekîtiya xwe komployê têkbibe’

**Navenda Nûçeyan**

**Komploya Navneteweyî ya 15’ê Sibatê ku li dijî Rêber Apo pêk hatibû ket sala 27’an, gelê Kurd bi berxwedanî û yekbûna xwe ya ku li ser bingehê felsefeya Rêber Apo ava kiriye, wê komployê têkbibe.**

Di 15’ê Sibata sala 1999’an de bi pilanên navneteweyî û kompiloyeke qirêj Rêber Apo dîl girtin û xwestin piroje û pilanên wî bişkînin. Lê gelê kurd bi têkoşîneke bê hempa felsefeya Rêber Apo berdewam kirin û xeta azadiyê bernedan, lewma dewletên hegemonîk careka din dixwazin bi rê û resmên nû kompiloyê li ser gelê kurd pêk bînin û wan di qirkirinan re derbas bikin.

Di derbarê kompiloya navnetewî ya ku li dijî Rêber Apo pêk hatî Endama Rêxistina jinê Macîda Ehmed û Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Raxîda Xelîl ji Rojnameya me re axivî.



Macîda Ehmed

**‘Bi rêbazên nû dixwazin kompiloyê careka din pêk bînin’**

Endama Rêxistina jinê Macîda Ehmed da zanîn ku kompiloya sala 1999’an ku li dijî Rêber Apo pêk hatî û kompiloya ku îro li ser gelê kurd pêk tê bi hev re girêdayî ne û wiha got: “Ji sala 1999’an ve heya roja îro gelê kurd hemû kiryar û kompiloyên dagirkeran vala derxistine. Hertim dixwazin di nav kurd û ereban de tevlîheviyan derxe û di bin navê dînê islamê DAIŞ perwerde kirin û dîn li ber çavê herkesî reş kirin lê ev pilan jî têk çûn. Yekîtiya civakê rê li pêşiya hemû pilanan girtin û bi yekîtıya xwe hebûna xwe isbat kirin. Di heman demê de ev nêzî mehekî ye bi rê û rêbazên nû komployeke din li ser gelê kurd pêk tînin û dixwazin bi lîstokên qirêj gelê kurd qir bikin. Tevî hemû êriş û pilanên ku rû didin û dorpêça li ser gelê Kobanê pêk tê jî lê hemû dewletên cîhanê xwe li hemberî van qetlîaman bêdeng dikin. Li kêlek wê bi riya ragihandinê dixwazin şerê nefsî pêk bînin li ser gelê kurd xwestin ku bivan êrişan îradeya gel bişkînin. Em jin bi taybet bi israrin ku çawa ev 15 salan me felsefeya Rêber Apo da meşandin, em ê berdewam bikin heya ku ev kompiloya qirêj bişkînin û Rêber Apo fîzîkî azad bibe. Di dema niha de pêwîste em bêtir xwe di milê zihnî de xwe pêş bixin û piştgiriya hêzên xwe bikin.”



Raxîda Xelîl

**‘Tu kes nikare gelê kurd têkbibe’**

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Raxîda Xelîl anî ziman ku ew li ser navê hemû jinên cîhanê kompiloya navnetewî şermezar dikin û wiha got: “Di şexsê Rêber Apo de kompilo pêk anîn da ku hêza gelê kurd bişkînin. Lê Rêber Apo bi têkoşîn û berxwedaniyeke mezin û bi pêşengtiya jinê karî vê kompiloyê vala derxe. Niha jî dewletên hegemon careke din kompilioyeke din li ser gelê kurd pêk bînin û wan tune bikin. Lê gelê kurd li ser fikir û felsefeya Rêber Apo bingehekî xurt avakirine û hemû lîstokên dijmin fam kirine lewma ne bi hesanî dijmin dikare gav bavêje di welatê me de. Herkesî hêrsa gelê kurd dît çawa daketin qadan û sekna xwe nîşan dan, bi taybet jina kurd rihê fedekariyê li gel wê nûjen bû û cihê xwe li kêlek şervanan girtin û soza berxwedaniyê nû kirin. Em wek jinên kurd soz didin heya ku Rêber Apo azad nebe em dev ji têkoşîna xwe bernadin û em ê berdewam bikin. Tu kes nikare gelê Rojava têk bibe û wê gelê kurd li herçar parçeyên Kurdistanê li ser piyan be heya ku mafê gelê kurd bidest bixe.”

# ‘Beşdarbûna Konferansê Miyûnix wê nehêle Kurd ji pêvajoyên pêşerojê werin paşguhkirin’

**Serokê Forma Almanî-Kurdî Yûnis Bhram diyar kir ku beşdarbûna Kurdan di Konferansa Miyûnxê de wê nehêle gelê Kurd li Sûriyê di pêvajoyên dema pêş de werin paşguhkirin û got, “Beşdarbûn pir erênî bû, lê divê xebateke siyasî ya nerm ji hêla nûnerên Kurdan ve were kirin”**

Hemza Sêvo

Ji 13 heya 15’ê Sibatê Konferansa Miyûnx a Ewlehiyê hat lidarxistin, gelek serokên welatan, serokwerzîr, wezîr û nûnerên hêzên leşkerî û siyasî û hwd… hat lidarxistin, tê de jî pêşengên Kurdan ji hêla siyasî û leşkerî ve beşdar bûn, weke rêveberê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî, hevseroka Desteya Têkiliyên Derve Ilham Ehmed, hem jî Serokê herêma Kurdistanê Nêçîrvan Berzanî. Derbarê lidarxistina konferansê, serokê Forma Almanî-Kurdî Yûnis Bhram bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Konferansa Miyûnxê xwedî girîngiyeke çawa ye li ser asta cîhanê û ji bo çi tê lidarxistin?**

Konferansa Ewlekariyê ya Miyûnxê yek ji girîngtirîn platformên navneteweyî yên salane ye ji bo nîqaşkirina pirsgirêkên ewlehî û siyaseta derve ya cîhanî. Ji sala 1963’an ve li bajarê Miyûnxê yê Almaniyayê tê lidarxistin, serokên dewlet û hikumetan, wezîrên parastin û derve, rêberên leşkerî, rayedarên Neteweyên Yekbûyî û NATO, herwiha pispor û nûnerên navendên lêkolînê li hev dicivin. Konferans ne saziyeke ku bibe cihê biryarê, lê ew wekî platformeke stratejîk ji bo avakirina lihevkirinekê û vekirina deriyê diyaloga paşîn dibe cihê sûdmendiyê. Di çarçoveya Sûriyê, hem Erebistan hem jî di nav de Kurdistan, Miyûnix gelek caran dibe cihekî ne fermî ji bo nîqaşên di navbera aliyên dijber û hêzên herêmî û navnetewî yên bibandor. Ev destpêkeke, wek faktor û bingehek ji bo sivikkirina bendên siyasî yên li ser Kurdan ji aliyê Şamê ve hatiye ferzkirin û ji hêla welatên herêmî ve tê piştgirîkirin. Beşdarbûna nûnerên Rojava û Başûrê Kurdistanê di platformeke navnetewî ya weke Miyûnixê de şikandineke ji bo bendên siyasî yên Şamê û fişarên Tirkiyê li ser gelê Kurd tên ferzkirin. Derketina li formeke navnetewî ya asta bilind rewabûna diyalogê leşkerî û siyasî dide hêzên Kurdî û dikare bigihîje asta naskirina dîplomatîk a fermî.

**Li gel beşdarbûna şandeya Kurdî ya Rojava û Başûrê Kurdistanên di konferansê de civîn û hevdîtin hatin lidarxistin, gelo ev yek çawa tê dîtin?**

Nîqaş û rûniştinên aliyên li Miyûnxê, wekî civîna bi Wezîrê Derve yê Amerîkayê re, herwiha şandeya Kongreya Amerîkayê, bi taybetî Lindsey Graham û civîna bi Serokkomarê Fransayê û şandeya Siûdî re, hem jî gelek kesayetên din re, kanalên rasterast ên ragihandinê bi aliyên bibandor re vedikin. Ev yek bi awayekî erênî ji bo gelek mijarên girîng tê vekirin Yek jê îhtîmala yekkirina Hêzên Sûriyeya Demokratîk di binesaziya dewletê de, nîqaşkirina formên nenavendîbûna îdarî û koordînasyona ewlekariyê di şerê li dijî komên radîkal de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Avantaja li vir ew e ku pêşniyara Kurdan ne tenê bi danûstandinên dualî yên bi Şamê re sînordar e, lê dibe beşek ji gotûbêjeke navnetewî ya berfireh li ser pêşeroja Sûriyê heye. Beşdarbûna pêşengên Kurdan hêzeke mezintir dide wan û derfetekê vedike ku nêrîna xwe pêşkêşî hêzên Rojava û Ewropî bikin. Ev yek hevsengiyeke rêjeyî li ber bandora serweriya herêmî yên wekî Tirkiye û Îranê pêktîne. Hebûna navnetewî nayê wateya çareseriyeke siyasî, lê nahêla ku gelê Kurd di çareseriyeke pêşerojê de werin paşguhkirin. Tevlîbûna tecrûbeya Rêveberiya Xweser di nîqaşên ewlehiya navnetewî de ji bo bingeh û rehendeke dîplomatîk ava dike. Li şûna ku wekî sîstemeke herêmî ya demkî were dîtin, nîqaş li ser tê kirin ku wekî modela rêveberiyê were pêkanîn, ev yek jî di çarçoveya dewleteke yekbûyî ya Sûriyê. Herwiha beşdarbûna şandeya Şamê bi şandeya Qamişlo re di civîna ligel şandeya Amerîkî de bandoreke mezintir kir û bi temamî naskirina hêz û fermiyeta daxwazên Kurdan pêkanî. Bi heman demê de daxuyaniyên birêz Lindsey Graham xwedî bandor û pîvanek siyasî ya girîngtir bû. Derxistina zagona ji bo parastina Kurdan an jî rizgarkirina Kurdan ne tenê tê wateya Kurdên Rojava, lê belê hemû Kurdên li tevahiya Kurdistanê di nav xwe de digire.

**-Yek ji girîngtirîn mijarên vê konferansê mijara Sûriyê û Rojava bû, aliyên cuda çawa li beşdarbûna Kurdan û doza Kurdî li Rojava çawa dinêrin?**

Şam her temsîlkariya cudayî xwe wekî binpêkirina serweriya dewletê dinirxîne. Enqere beşdarbûna Kurdan di Konferansa Miyûnxê de wekî hewildanek ji bo fermiyetdayîna statûyeke ku ew ji bo ewlehiya welatê xwe gef û tiştekî metirsîdar dibîne. Hin welatên rojavayî hebûna Kurdan wek rastiyeke meydanî dinirxînin, bi taybetî di mijara şerê li dijî terorê de. Amadebûna şandeyeke Kurdî ya bi navê General Mezlûm Ebdî û kina ji pola (Ilham Ahmed) ku bi piştevanî û hevkariya serokê Herêma Kurdistanê li Başûrê Nêçîrvan Barzanî, di formeke navnetewî de bandorên siyasî yên kûr bi xwe re tîne. Yek jê qebûlkirina piralîbûna hêzên Sûrî her çend ev ne naskirineke qanûnî be jî, lê ev pejirandina navnetewî nîşan dide ku çareserî li Sûriyê di yekalîbûnê re derbas nabe. Danûstandinên serbixwe ji bo pêşkêşkirina daxwazên zelal bêtir cih peyda dike. Li şûna ku di nav şandeyeke yekbûyî ya hikumetê de were yekkirin û hêza wan a derbirînê tune be, serxwebûna şandeyeke xwedî biryar baştir e. Li hêleke din bandora neyekser li ser lihevkirinên bi Şamê re pêktîne.

**-Çiqasî beşdarbûna Kurdan di konferansekî wiha de bi rengekî fermî bi wate bû û çima beriya niha nûnerên gelê Kurd ên Rojava beşdarî konferansekî wiha nedibûn?**

Eger em li konteksta Konferansa Ewlekariyê ya Miyûnxê ya 2025-2026’an binêrin, beşdarbûna Kurdan ji hêla siyasî ve karaktereke zelaltir girtiye. Ew êdî ne tenê bi civînên marjînal(civînên li kêleka konferansê) ve sînordar e, lê ber bi pêşkêşkirina nerînkek berfireh ve. Nerîn li ser pêşeroja nenavendîbûnê li Sûriyê, hem jî bidestxisitina mafê çandî û siyasî di hundirê destûrê bingehîn ê Sûriyê de, li hêleke din Jinûveavakirina sîstema ewlekariyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Hebûna navnetewî ya Kurdan çiqas zêde bibe, hêza wan a danûstandinan ewqas zêde dibe. Nemzaze li ser mijara hêzên îdarî, avakirina hêzên herêmî, bidestxistina mafê netewî di destûrê de. Hat diyarkirin ku çawa yekîtiya siyasî û civakî ya Kurdistanê û di warê leşkerî de li tevahiya erdnîgariya Kurdan giraniyeke zêde daye doza Kurdan, bi taybet di formên navneteweyî de. Lê belê ev yek dikare hesasiyetên siyasî li Şam û Enqereyê zêde bike, dibe ku ev beşdarbûna Kurdan di furmeke wiha de hin rêyan tevlihev bike eger bi şêwazê siyasî yê bilind neyê birêvebirin. Di salên borî de, beşdariya Kurdan tenê bi siyasetmedarên Başûrê Kurdistanê re sînordar bû bi taybetî birêz Nêçîrvan Barzanî û Mesrûr Barzanî, hem jî nûnerên Rojavayê Kurdistanê gelek caran bi awayekî nefermî an jî bi rêya civînên tekane beşdarî konferansê bûn. Paşguhkirina Rojava ji ber wê sedem ew bû ku nerazîbûnên herêmî, di piraniya rêyên sîyasî yên navnetewî yên girêdayî Sûriyê, wek mînak Cinêv an jî Astanayê, hebû, nûnertiya serbixwe ya zelal ji bo Rojava nehat dayîn. Di sala 2025’an de, ez cara yekem li ser navê Rojava beşdarî Konferansa Miyûnxê bûm û ev konferans di nav derdorên siyasî û medyayê de bi berfirehî deng veda.

**-Wê Konferansa Miyûnxê û beşdarbûna nûnerên Kurdan çi encamê ji bo gelê Kurd bi xwe re bîne?**

Beşdarbûna Kurdan di Konferansa Miyûnxê de nayê wateya naskirin û qebûlkirina bi dewleteke serbixwe ya Kurdan, lê ew derbasbûna ji dergehên paşguhkirinê ber bi maseya navnetewî ve temsîl dike. Ev gavek di rêyeke dirêj de ye ev yek jî bi têkiliyên di navbera navend û aliyên Sûriyê de têkildar e, ew jî li ser bingeha hevkariya rasteqîn ji bo rêvebirina Sûriyê. Ji hêla siyasî ve beşdarbûna Kurdan di konferansê de fermiyeta aliyekî peywendîdar ku bibe muxatebê diyaloga navnetewî. Di heman demê de parastina rêjeyî bi rêya guhdana navnetewî ji doza gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê re pêktê. Herwiha derfetek ji bo xurtkirina mafên destûrî di nav nîqaşeke gerdûnî de çêdibe. Lê belê, bandora wê ya dawîn girêdayî hevsengiya hêza herêmî, asta amadebûna Şamê ji bo pejirandina modeleke rastîn a nenavendî û şiyana hêzên Kurdî ji bo veguherîna xebata dîplomatîk bo peymanên pratîk û domdar di nav dewleteke yekbûyî ya Sûriyê. Herî dawî divê rola serok Nêçîrvan Barzanî neyê jibîrkirin, ji ber ku wî peywendiyên dîplomatîk di navbera şandeya Kurd a Rojava li Kurdistanê û şandeyên di Konferansa Miyûnxê de, dan avakirin.

## Çima êrişî Rêveberiya Xweser kirin?



Dilyar Cizîrî

Gelê kurd û bi serkêşiya Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê guhertineke dîrokî, afirandin. Di Rojhilata Navîn ku jêdereke sereke ya aboriya cîhanê ye û dinavenda berjewendiyên hêzên hegemon de ye. Modela Netewa Demokratîk ji bo çareserî û azadiya gelan piratîze kirin. Ev bi şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an de ronî dît û ket piratîkê. Di ezmûna 14 salan a modela Netewa Demokratîk de serkeftina xeta aştî û biratiyê xwe da der. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevî kurt û kêmasiyan karîbû di nava agirê nakokiya hêzên hegemon ên navdewletî de, gavên mezin, pêk bîne. Ev jî ne li gorî berjewndiya hêzên serdest ên hegemon bû. Ne dixwestin gelê Sûriyê bi aştî, biratî û wekhevî bi hev re jiyan bike. Pirsgirêkên xwe çareser bikin. Heger kirin, tê wateya tu karê hêzên serdest di herêmê de tuneye. Ji lewma li dijî Rêveberiya Xweser û hêza wê ya leşkerî komployek mezin dan meşandin. Ev komploya piralî û berdewam bi itfaqa di navbera Hikûmeta HTŞ’ê û Îsraîlê ya di 6’ê Çile de li Parîsê bi serkêşiya DYA’yê pêk hat, zêdetir hate aşkerekirin. Ji vir ve êrişa li dijî taxên kurdan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hate destpêkirin. Di vê êrişê de rola serkêşiyê ji Dewleta Tirk û Erebistana Siûdiyê re hate dayîn. Qeter, Ordin û hin welatên din ên ereban di nava plana dijber de cih girtin. Hemû cûreyên piştgiriya leşkerî û istxbaratî dan dewleta Tirk û çeteyên wê. Her çendî di bin navê Artêşa Sûriyê êriş pêk anîn. Ê êriş bi rê ve dibir artêşa Tirk bû.
Piştî Helebê êrişên xwe dewam kirin û di herêmên Rêveberiya Xweser ên piraniya nifûsa wan erebin dewam kirin. Di herêmên wekî Tebqa, Reqa, Dêra Zorê xwestin şerê heyî veguherînin şerê kurd û ereban. Hêzên QSD’ê ji bo rê li ber şerekî wiha bigrin, biryara vekişîna ji wan herêman da. Lê êrişkaran di wir de jî êrişên xwe dewam kir. Di Dêrhafir de û di dema hêza QSD’ê xwe paş de vedikişand, êrişên herî dijwar pêk anîn. Lê dema şer giha meydana Rojava dengeyên şer hatin guhertin û şervanan derbeyên giran li êrişkaran xistin. Di encamê de ew anîn peymana 29’ê Çile û gavên niha têne avêtin. Beşdarbûna nûnerên Rojava di Kongereya navdewletî ya Miyûnixê jî berdewama wê ye.
Di vê meh û nîvê de mirov baş dibîne, çawa hegemoniya cîhanê komplo li dijî Netewa Demokratîk û çareseriya li ser esasê hevgirtina civakî pêk anîn. Ji ber serkeftina vê sîstemê têkçûyîna berjewendî û hegemoniya wane. Heta ji wan were jî dê rê nedin gelê herêmê bi xwe rêveberiya xwe bikin. Bi taybet jî li Sûriyê ku xwedî cihekî stratejîk û jêdera aboriyê ye. Modela li Sûriyê serwer bibe, dê yek ser bandora xwe li cîhana ereban û tevahî Rojhilata Navîn bike. Ji ber wê jî dixwazin sîstema xwe ya netewperest, serwer bikin. Ev jî tê wateya dê kawis û aloziya di herêmê de dewam bike. Aloziyên niha di herêmên Sûriyê de ji rojên destpêkê ve nîşan dide.



# ‘Ji bo koçberan Heyva Sor her di nav tevgerê de ye’

**Hevseroka Heyva Sor a Kurd Newroz Hesen diyar kir ku ji roja seferberî li Rojavayê Kurdistanê hat ragihandin, Heyva Sor di nav tevgerê de ye û bi hemû hêza xwe hewil dide barê koçberiyê li ser koçberan sivik bike.**

Berçem Silêman / Dêrik

Li seranserî Rojavayê Kurdistanê gefên êrişan pêktên û dewletên hegemon dixwazin hebûna gelê Kurd ji holê rakin, lewma êrişkaran dest danîn ser gelek mal û milkên gelê Kurd, Kurd jî neçar bûn di vê rewşa zehmet de koçber bibin û rastî gelek nexweşî, êş û azaran werin. Lewma li seranserî cîhanê gelê Kurd rabûn ser piyan û destek dan gelê Kurd li Rojava, ji bo wan alîkarî rêkirin û bi riya Heyva Sor a Kurd li koçberan alîkarî hatin belav kirin û heya niha jî di hemû milî de destekdayînê didin koçberan. Di derbarê kar û xebatên Heyva Sor a Kurd li Rojavayê Kurdistanê Hevseroka Heyva Sor Newroz Hesen ji Rojnameya me re axivî.



**‘Ji bo koçberan Heyva Sor her dinav tevgerê de ye’**

Newroz Hesen da zanîn ku dema êriş li ser Rojavayê Kurdistanê rûdan û gelê Kurd koçber bûn Heyva Sor erk girt ser milê xwe ku destek bide koçberan û wiha got: “Dema koçberan berê xwe dan bajarê Dêrikê li dibistan û mizgeftan bicih bûn me wek gava destpêkê hin pêdiviyên sereke ji wan re peyda kirin. Di heman demê de me embolansê xwe kirin tevgerê da ku di xizmeta koçberan de bin û li kêlek wê kilînîka me ya gerok jî her amade bû ji bo rewşên awarte ji ber ku avhewa gelek zor bû zarok rastî gelek nexweşiyên giran dihatin. Herwiha dema Komeleya Xêrxaziya Berzanî alîkarî ji bo koçberan rê kirin têkilî bi Heyva Sor re kirin û bi riya me derbasî Rojava bûn û serlêdana koçberan kirin û di hemû milî de destek dan koçberan. Di heman demê de gelek zarokên piçûk hebûn hewceyî şîr bûn, lewma me pêwîstî dît ku şîr ji van zarokan re peyda bikin û li ser wan belav bikin. Li kêlek alîkariyê embolansê me şev û roj di xizmetê de ne û dem bi dem serlêdana koçberan dikin û çi rewşên ewarte derkevin koçber têkliyê bi me re dikin.”

**‘Heyva Sor hertim li kêleka Gel e’**

Newroz Hesen axaftinên xwe wiha domand: “Şêniyên bajarê Dêrikê û Rêvebriya Xweser jî ji bo destekdayîna koçberan, gelek alîkarî pêşkêşî wan kirin û heya niha jî dikin. Herwiha Heyva Sor derbasî xetên gundan jî bû û koçberên li wir dimînin bi wan re bûn alîkar. Lê kêlek alîkariyan Heyva Sor sotemenî jî li koçberan belav kir da ku di vê zivistanê de rewşa wan zehmetir nebe û nexweşiyên wan girantir nebin. Di heman demê de jî me berê xwe da deriyê Sêmalka jî ji ber ku gelek destên alîkariyê ji Başûrê Kurdistanê derbasî Rojava bûn, lewam ew alîkarî radestî Heyva Sor dibûn û me li koçberên li Dêrik, Qamişlo û Hesekê belav dikirin. Mîqdarek derman jî ji gelê me yê Başûr gihiştin nav destê me, em gelek serbilind in ku ew bi vê rolê radibin û êşa koçberan hîs dikin. Herwiha şandeyek bijîşk jî ji Başûrê Kurdistanê bi riya Desteya Tenduristî û Heyva Sor derbasî Rojava bûn û serlêdana koçberan kirin û pêdivî di milê derman de ji wan re peyda kirin û gelek kes hebûn hewceyê emeliyatan bûn û ew bijîşk bi erkê xwe rabûn. Em wek Heyva Sor a Kurd hertim li kêlek gelê xwe ne, em ê careke din alîkariyê belav bikin û çi kesê hewceyê emeliyatan yan kesên ku hewceyî milên pirotezî bin em navê wan tomar dikin da ku em bi wan re bibin alîkar. Em hêvîdarin herkes alîkariyê bide koçberan û spasiya herkesî dikin ku destê alîkariyê dayî Heyva Sor û gelê Rojava, em bi hêvîne bi vê destekdayînê berdewam bin heya ku ev rewş bidawî bibe.”



# Di dilê her koçberekî/ê de çîrokeke xemgîn heye

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Bi hezaran çîrokên koçberan ên bi xemgînî, kul û êş hene ku di her koçberiyekê de zehmetiyeke jiyanî dîtine. Yek ji wan çîrokan a Binefiş Cimo ku li kêlek zehmetiyên koçberiyê, êşa sê zarokên xwe yên şehîd dikşîne.**

Xelkên Efrînê çar car in ku ji cih û warê xwe koçber bûn û di her cihekî ku koçber dibûn, zehmetiyek dikişandin. Serpêhateya dayîka koçber dema li gundê Tirindê yê li bajarê Efrînê de sê zarokên wê di teqînê de şehîd bûn û kurekî wê jî astengdar bû. Wê di jiyana xwe de gelek xemgînî û zehmetî dîtine. Ji ber koçberiya wan jî, lê kêfxweş e ku kurekî wê li gel wê maye.

**Çîroka dayikeke koçber**

Dayikek koçber bi navê Binefiş Cimo ku ji gundê Tirindê yê bajarê Efrînê ye. Ew jineke ku temenê wê 48 salî ye. Xwedî malbateke ku ji şeş kesan pêktê. Tenê çar zarokên wê sê kur û keçek hebûn. Hevjînê wê jineke din anî û ew jî bû xwedî du zarok. Ew destpêkê li gundên Tirindê yê li bajarê Efrînê diman û weke her maleke xizan jiyan dikirin. Dema ku li Efrînê şer çêbû, li pêşiya mala wan teqînek çêbû û di wê teqinê de sê zarokên wê şehîd bûn û kurekî wê jî astengdar bû. Di şer de ew koçberî gundê Şehbayê bûn. Di jiyaneke zehmet de derbas bûn. Wê gelekî xemgînî dît. Ew her tim jiyana xwe wek her dayikekê ku parçeyek xwe daye bi girî û xemgînî derbas dike.



Piştî koçberiya wan li Şehbayê, 6 salan li wir jiyan kirin. Wan 6 salan li Şehbayê jiyaneke zehmet ya koçberiyê jiyan dikirin. Her tim dixwestin ku vegerin gundê xwe yê Tirindê lê dema ku zarokên wê dihatin bala wê ew xemgîn dibû û nedixwest ku vegere. Paşê dema ku careke din li Şehbayê şer çêbû wan berê xwe da bajarê Reqayê. Li Reqayî cihê xwe di dibistanan de girtin. Ji ber tu kesî wan li bajarê Reqayî tune bû ew di dibistanan de man. Di dibistanên bajarê Reqayê de salekê tê de jiyan kirin. Lê belê ew ne bi jiyana ku tê de jiyan dikir difkirî, ew bi zarokên xwe yên şehîd difikirî.

**Xemgîniya her koçberekî**

Her tim bi dilekî xemgîn bi kurê xwe yê mayî re şah dibû û dixwest ku rewşa wî baş be. Lê ji ber şezaya ku ketî serê kurê wê û lingê wî yê asteng digot: “Ji ber vê rewşa kurê min jî ez kêfxweş im ku ev kurê min li ba min ma.” Jiyana wan hemû bi koçberiyê û xemgîniyê derbas bû. Lê tevî wiha jî hemû zehmetiyên jiyanê jî li ber xwe didan.
Dema ku di vê demê de êrişên hikumeta demkî û DAIŞ’ ê li ser bajarê Reqayê çêbûn. Careke din koçber bûn û berê xwe dan bajarê Qamişlo. Ji ber ku erebeya wan tune bû ew bi dilekî tirs li bajarê Reqayê man û dixwestin weke her kesî ku berê xwe didan qadên bi ewle ew jî hewil didan bi şêwazekî xwe bighinin wan qadan, ku zerer negihêje wan. Ew bi dilekî tirs li wir dimînin heya ku dibe roja din û hinek wan bi xwe re tînin. Dîsa hatin di dibisanên Qamişlo de bicih bûn. Niha li bajarê Qamişlo dimîne û dibêje ew tiştekî naxwaze, lê dixwaze kurê wê baş bibe. Di jiyana xwe de ji destpêka li gundê Tirindê heya niha li bajarê Qamişlo, bi hemû zor û zehmetiyan re rû bi rû hatin. Tevî vê êşa di dilê wê de ew bendewara vegera li Efrînê, vegera gundê xwe ye yê ku tê de kezeba wê hate şewtandin.

## Bîra Civakê

## Entegrasyona demokratîk hişmendiya cudakariya civakî red dike



Ehmed Hesen

Ji êrîşên 6’ê çileyê yên li ser Taxa Şêxmeqsûd û heya 10’ê sibatê li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriye gelek guhertin û rûdan qewimîn, HTŞ’ê li dijî civaka kurd şerê qirkirina etnîkî da destpêkirin û armanc ew bû ku hebûna civaka kurd ji holê rake, di heman demê de ya herî xirab ew bû ku gelê ereb li dijî kurdan da sorkirin û hewla şerkirina kurd û ereban xist rojeva xwe ya esasî, di serî de di kesayeta rêber Apo de rê li ber vê şerê civakî ya Kurd û Ereban hat girtin, destwerdana rêbertî ya ji Îmralî careke din rihê çareseriya demokratîk derxist pêş. Armanca bingehîn a van êrîşan ew bû ku civakan li dijî hev bidin sorkirin, dewleta Tirk bi riya HTŞ Rojava dagir bike û xeta mîsaq û milî veke, di heman demê de hevgirtina civakî parçe bike, ya ku rê li ber vê qirkirinê girt peradîgma entegrasyona demokratîk a rêber Apo ye, ji ber ev peradîgma li şûna cudakariyê yekîtiyê, li şûna parçekirinê yekbûnê, li şûna paşguhkirinê pirrengiyê û li şûna neteweperestiyê pirnetewbûnê esas digire û azadiya civakî diparêze. Ger ku entegrasyona demokratîk hem li bakurê Kurdistanê û hem jî li Rojavayê wê weke peradîgmayeke çareseriyê were bingehgirtin, wê rê li ber qeyranên mezin û parçebûna xaka Sûriye û Turkiyeyê were girtin, ji ber ku hêza aqilê civakî dikare li ber sînorên şer û qirkirinê bibe benda çareseriyê. Lê feraseta ku bi mejiyê Colanî û Erdoxan tê meşandin berovajî vê yekê nîşan dide, Erdoxan û hikûmeta AKP-MHP’ê bi armanca tesfiyekirina doza kurdan nêzî pirsgirêka kurd dibin, di heman demê de Colanî bi feraseta avakirina dewleta Îslamperest a xîlafetê li pirsgirêkên pêkhateyan dinêre, ango her du jî wê yekê dikin ku civaka kurd ji civakên din biqetînin û dawî lê bînin. Komkujiyên li Şêxmeqsûd û dorpêça li Kobanê qewimîn vê yekê piştrast dikin. Lewma jî çendîn behsa çareserî û diyalogan were kirin jî, feraseta cudakariya civakan neyê guhertin zehmet e ku entegrasyona demokratîk were bicihanîn. Yên ku vê guhertinê pêk bînin û çarenûsa azadiya xwe diyar bikin jî etnîk û civaka Sûrî yê ye, divê civaka Sûrî bi Kurd û Ermenên xwe, bi Ereb û Çerkezên xwe vê barê bicihanîna jiyana hevbeş hilgirin û rê nedin destwerdanên ji derve taybet ên dewleta Tirk û berjewendiyên wê. Weke encam ji bo avakirina sîstemeke pirreng peradîgma civaka demokratîk dikare bibe riya herî sereke ya dawîanîna li qeyranên ku civakên Sûriye û Rojhilata Navîn jiyan dikin, ji ber ku di nava xwe de kakilê azadiya etnîkî, bîrdozî û zayendî bingeh digire. Her wiha ji bo pêşxistina sîstemeke ku bi azadiya hemû pêkhateyên Sûriye re li hev dike dikare bibe mînaka herî serkeftî.